Dr. Sapan: Ragihandina Kurdî hizbî tevdigere

RAGIHANDINA Kurdî bi şêweyekî giştî ragihandina hizbî ye û fikrên hizbayetî ji bo dewletbûn û pêşketinê karîgeriyeke baş nakin.

RÛPEL 06

Netîceya musabeqaya xelata kovara Vateyî

XELATE warê şîîre de layiqê şîîra "Birînê Tegelinî" ya Ugur Kirmancî, warê hîkaye de zî layiqê hîkayeya "Şadîya Şade" ya Qemer Erdoganî ameye dîyayene.

RÛPEL 10

Nadia Visser: Muzîka Kurdî bi êşên kûr hatiye pêçan

STRANÊN muzîka pop ya Îngilîzî tenê li ser dildarî an jî hevberdana dildaran e lê muzîka Kurdî, bi taybetî jî ya Zazakî bi êşên kûr hatiye pêçan.

RÛPEL 14

bas

HEFTENAMEYA NÛÇEYÎ Û ŞIROVEYÎ
HEJMAR: 15
18 - 23 NÎSAN 2017
www.basnews.com

SERXWEBÛNA KURDİSTANÊ:

HELWESTA ÎRANÊ DIGÛHERE?

KURDISTANA SERBIXWE JI BO ÎRANÊ FERSENDEK E

Hewlêr ji bo Îranê gelek girîng e. Polîtîkaya ku Serokê Kurdistanê Mesûd Barzanî birêve dibe dîplomatîk û stratejîk e. Îran, Goran, YNK û partiyên din zêde mixatab nagire, lêbelê Îran, Serokê Kurdistanê Barzanî weke serokê dewletekê mixatab digire.

REFERANDÛM WÊ KENGÎ BÊ KIRIN?

Mijareke girîng jî dema pêkanîna referandoma serxwebûnê ye. Di vê mijarê de du dîrok derdikevin pêş. Tê pêşbînîkirin ku referandoma serxwebûna Kurdistanê an di 16ê Mijdarê de li gel hilbijartinên parlamentoyê bê kirin an jî beriya hilbijartinên parlamentoyê di meha Îlonê de bê kirin.

HOŞENG OSE >05
"Şoreşa Rojava" ... Şevreşa Rojava

EKREM ÖNEN >06
Roja Rojnamegeriya Kurdî pîroz be

JAN DOST >07
Rola xayînên wêjeyê

FIRAT CEWERÎ >08
Kurdên Swêdê û çapemeniya wan

PROF. DR. CEBAR QADIR:

NASNAMEYA KERKÛKÊ KURDISTANÎ YE

GELEK çavkanî û dokumentên dîrokî hene. Eger temaşayî her nexşeyekî zanistî bikî dibînî ku Kerkûk xistine nava Kurdistanê de. Kerkûk weke beşeke ji axa Kûrdistanê nîşan kirine.

03

ENCAMA REFERANDÛMÊ:

JI BO KURDAN HEWAYEKÎ ERÊNÎ TÊ AFIRANDIN

TIRKIYE, di 16ê Nîsanê de cara 8mîn ji bo referandûmê çû ser sindoqan. 18 madeyên destûrê û pergala ku bi navê "Pergala Hikûmeta Serokkomariyê" tê zanîn ji ji aliyê gel ve bi sedî 51ê dengên 'Erê' hat pejirandin.

05

Kurdistan çarenûsa xwe diyar dike; Helwesta Îranê çi ye?

"TIRS Û FIKARÊN ÎRAN Û TIRKIYÊ HEVPAR IN"

Akademîsyênê ji beşa Pêwendiyên Navnetewî yê Zankoya Abant İzzet Baysalê Özkan Gökcan, radigihîne ku siyaseta Îranê ya li dijî Kurdistanê berdewam dike û wiha pê de diçe: "Meseleya sereke ya ku Îran, Tirkiye, Îraq û Sûriyê tîne cem hev, meseleya Kurdan e ku li her çar perçeyan jî heye. Hêj zû ye ku bê gotin Îranê dev ji siyaseta xwe ya berê berda ye. Ji ber ku du sedem hene Îranê dixe nav tirsê; Yek dewleteke ku di kontrola Amerîkayê de ava bibe û ya din jî bandora ragihandina dewleta Kurdî ya li ser Kurdên Îranê. Ev tirs û fikar ji bo Îranê jî derbasdar in."

Herwiha Gökcan li ser siyaseta Îranê jî disekine û aşkere dike ku siyaseta Îranê ya derve pragmatîst e û li gor konjoktûrê tevdigere. Gökcan axaftina xwe wiha bi dawî dike: "Ez di wê baweriyê de me ku daxuyaniyên rayedarên Îranê yên dawîn li gor konjonktûrê ne. Lêbelê helbet di vir de hewldanên partiyên Kurdistanê wê diyarker bin. Geşedanên li herêmê, helwesta Tirkiyê û DYA jî di vir de girîng in. Ragihandina dewleta Kurdî wê geşedanek mezin be û wê bandoreke mezin bike li ser herêmê. Di rewşa niha de êdî aktorên heremî jî û zilhêzên cîhanê jî rastiya serxwebûna Kurdistanê dibînin û dizanin ku Kurd herî zêde di vê serdemê de nêzî serxwebûna xwe bûne. Di vê proseyê de barê herî mezin dikeve ser milên rayedar û partiyên Kurdistanê. Beriya her tiştî divê di proseya serxwebûnê de nakokiyên di navbera xwe de deynin aliyekî û yekitiyekê ava bikin, weke yek deng derkevin pêşberî cîhanê û vê daxwaza xwe ya rewa bînin ziman. Eger ev bê kirin dê gelek karîger be."

"KURDISTANA SERBIXWE JI BO ÎRANÊ FERSENDEK E!"

Serokê Enstîtûya Kurdistanê yê Tehranê Bahram Valadbaigi jî dibêje Îran ne li dijî serxwebûna Kurdistanê ye û axaftina xwe wiha berdewam dike: "Em weke rewşenbîrên Kurd ên li Îranê, piştgiriyê didin serxwebûna Kurdistanê. Ragihandina Kurdistana serbixwe bo Îranê ne gef, berovajî wê fersendek e. Peywendiyên di navbera her du aliyan de dîrokî ne. Herwiha peywendiyên Mesûd Barzanî û Celal Talabanî yên bi Îranê re digihijin 40 salan. Hewlêr ji bo Îranê gelek girîng e. Polîtîkaya ku Serokê Kurdistanê Mesûd Barzanî birêve dibe dîplomatîk û stratejîk e. Îran, Goran, YNK û partiyên din zêde mixatab nagire, lêbelê Îran, Serokê Kurdistanê Barzanî weke serokê dewletekê mixatab digire."

"Dibe ku rastî hin astengiyan were"

Valadbaigi amaje bi wê yekê kir, dema ku Kurdistanê serxwebûna xwe ragihand dê rastî hin kêşeyan bê û wiha dewam kir: "Dema dewleta Kurdistanê hat ragihandin, nexşeya Îraqê wê xera bibe. Li Îraqê beşeke Erebên Sûnne û Şîa li dijî dewletbûna Herêma Kurdistanê ne. Herwiha beşeke ji Şîayên Îranê jî li dij in. Li Tirkiyê jî aliyek li dij serxwebûnê derdikevin. Li hêla din dema DAIŞ bi temam hat jinavbirin jî wê kêşe di navbera Kurd, Ereb, Şîa û Sunneyan de rû bidin. Ji ber van sedeman dema ku dewleta Kurdî hat ragihandin wê rastî hin kêşe û arîşeyan were."

"ÎRAN NE LI DIJÎ SERXWEBÛNÊ YE"

Li hêla din Berpirsyarê Pêwendiyên Îranê yê Hikûmeta Herêma Kurdistanê Abdullah Akreyî aşkere kir ku Îranê heta niha bi awayekî fermî dijayetiya xwe ya li hemberî serxwebûna Kurdistanê ji wan re ranegihandiye û wiha got: "Heta niha tenê rêveberekî ji wezareta derve ya Îranê diyar kiriye ku niha ne dema referandûmê ye. Jibilî wê yekê, dewleta Îran heta niha helwesteke fermî nîşan nedaye. Li gor çavdêriyên me Îran proseya referandûma serxwebûnê weke geşedaneke asayî dibîne."

Mistefa Şefîk Şêwirmendê Serokwezîrê Hikûmeta Herêma Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî jî da zanîn ku di rastiyê de Îran li dijî serxwebûna Kurdistanê ye, lêbelê piştî tundbûna helwesta DYA ya li herêmê, Îran di vê polîtîkaya xwe de nerm bûye û weke berê tevnagere.

HELWESTA ÎRANÊ ÇI YE?

Serokê DYA yê nû Donald Trump jî li hember kiryarên Îranê yên li herêmê piştgiriya daxwaza Kurdan a serxwebûnê dike. Bi taybet jî piştî midaxeleya DYA ya Îdlîbê û tundbûna helwesta DYA, tê pêşbînîkirin ku Îran li şûna ku Kurdistanê bide hemberî xwe dê siyaseta xwe ya li dijî Kurdan biguhere.

Tê zanîn ku Fermandeyê Supayê Quds ê Îranê General Qasim Silêmanî li ser mijara referandûma serxwebûna Kurdistanê di 8-9ê Nîsana îsal de serdana Silêmaniyê kir. Li gor agahiyên ku Basê bi dest xistine Silêmanî, li ser mijara referandûmê bi rayedarên YNK'ê re hevdîtin pêk anî. Tê gotin ku Qasim Silêmanî di vê hevdîtina xwe de di derbarê referandûmê de ji rayedarên YNK hûrgilî û agahiyên zelal xwastin û nêrîna welatê xwe bi serkirdeyên YNK re parve kir.

Li gor berpirsekî ku ne xwast navê xwe aşkere bike ji Rojnameya Basê re aşkere kir ku Silêmanî di vê hevdîtinê de ev pirs û gotin ji serkirdeyênYNK kirine:"Em dixwazin tenê vê yekê hîn bibin; Gelo çi qewimî ku we biryara pêkanîna referandûmê girt. Di civîna YNK û PDK de çi çê bû û hat axaftin ku YNK di vê mijarê de bi PDK re tevdigere û di heman fikrê de ye?" Tê diyarkirin ku fermandarê Îranî ji serkirdeyên YNK re ragihandiye ku fikarên wî hene wê dewleta Kurdistanê ji wan re bibe gef an na û pirsa 'ji bo rakirina van fikaran di destê wan de tiştek heye an nîne kir?'

Li gor wî berpirsî di vê hevdîtinê de; Cîgirê Sekreterê giştî yê YNK Kosret Resûl , Berpirsê Mekteba Siyasî yê YNK Mela Bextiyar û Endamê Polîtburoya YNK û Hevjîna Sekreterê Giştî Celal Talabanî Hêro Îbrahîm Ehmed cih girtin. Herwîha di rojên pêş de wê heyetek ji Hikûmeta Herêma Kurdistanê bi rojeva referandûma serxwebûna Kurdistanê serdana Îranê bike.

ÊWAR HAVÎN – MURAT ÖZDEMİR

HIKÛMETA Herêma Kurdistanê, ji bo pêkanîna serxwebûna Kurdistanê ku xewna hemû miletê Kurd e, ketiye nav xebat û hewldanên girîng. Hikûmeta Herêma Kurdistanê beriya niha aşkere kiribû ku îsal wê referandûma serxwebûnê bê kirin û ev biryar jî ji aliyê Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî ve ji Sekreterê Giştî yê Netewên Yekgirtî (NY) Antonio Guterres re hatibû ragihandin. Herwiha Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK) û Yekitiya Niştimaniya Kurdistanê (YNK) bi rojeva Serxwebûna Kurdistanê kom bûbûn. Di vê civînê de ku bi serpereştiya Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî pêk hat de biryara pêkanîna referandûmê hat girtin û komîteyeke hev beş ku dê mijara referandûmê bi aliyên siyasî re gotûbêj bike hat avakirin. Piştî ku komîteya hev beş hevdîtinên xwe yên bi partiyên siyasî re qedandin, ji bo gotûbêjkirina refarandomê û herwiha mijara bilindkirina ala Kurdistanê li Kerkûkê serdana Bexdayê kir. Di vê komîteyê de Serokê Dîwana Serokatiya Kurdistanê Fuad Husên, Sekreterê Polîtbûroya PDK'ê Fazil Mîranî û Endamê Polîtbûroya YNK'ê Dr. Roj Nurî Şawesyer cih girtin.

Şanda hev beş ya Kurdistanê li Bexdayê bi Serokkomarê Îraqê Fuad Masum, Serokwezîrê Îraqê Heyder Îbadî, Serokê Parlamentoya Îraqê Selîm Cibûrî, Rêveberên Tevgera Sadr û Serokê Hevpeymaniya Niştimaniya Şîa re hevdîtin pêk anîn. Piştî hevdîtinan, Şanda Referandûma Serxwebûna Kurdistanê da xuyakirin ku hevdîtin gelek erenî derbas bûne. Tê diyarkirin ku her çiqas Bexda li dijî pêkanîna referandûma serxwebûna Kurdistanê nebe jî, dixwaze referandûm piştî têkbirina DAIŞ'ê ku gefa hevpar e, pêk were. Li aliyê din Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî ji bo gotûbêjkirina mijara pêkanîna referandûma serxwebûna Kurdistanê bi balyoz û nûnerên 35 welatên ku li Kurdistanê ne re hevdîtin pêk anî û di derbarê vê mijarê de agahî dan nûnerên dewletan.

Referandûm wê kengî bê kirin?

Mijareke girîng jî dema pêkanîna referandûma serxwebûnê ye. Di vê mijarê de du dîrok derdikevin pêş. Tê pêşbînîkirin ku referandûma serxwebûna Kurdistanê an di 16ê Mijdarê de li gel hilbijartinên parlamentoyê bê kirin an jî beriya hilbijartinên parlamentoyê di meha Îlonê de bê kirin. Li gor berpirsên Hikûmeta Herêma Kurdistanê, referandûma serxwebûna Kurdistanê nayê wê wateyê ku dê demildest dewlet bê îlankirin. Armanca sereke ya referandûmê ew e ku biryar û îradeya miletê Kurdistanê nîşanî dewletên herêmê û raya giştî ya navnetewî bide. Berpirsên Hikûmeta Herêma Kurdistanê di wê baweriyê de ne ku dewletên cîran û raya giştî ya navnetewî ne ku helwesteke neyînî li dijî pêkanîna referandûma serxwebûna Kurdistanê nîşan didin. Nemaze jî serkeftina Kurdistanê ya li hember DAIŞ'ê û pêkvejiyana kêmnetew û olên cûda ya demokratîk li Herêma Kurdistanê bandoreke mezin heye li ser razîbûna raya giştî li hember dewleta Kurdî.

"Divê dewletên cîran rastiya Kurdistanê qebûl bikin"

Mamosteyê Zankoya Selahadînê Dr. Evdilhekîm Xesro ji rojnameya me re aşkere dike ku Niha dewletên cîhanê, bi çavê dewleteke serbixwe li Herêma Kurdistanê dinêrin û wisa têkiliyên xwe datînin. Divê Îran û Tirkiye jî vê yekê qebûl bikin. Rast e heta niha jî serxwebûna Kurdistanê nehatiye ragihandin, lêbelê bi her awayê xwe ve jî wek dewletek serbixwe tê îdare kirin. Divê êdî ev rastî bê qebûlkirin. Li dijderketina vê rastiyê ne li gor berjewendiya van dewletan e jî.

Dr. Xesro radigihîne ku dewleta Îranê wê ji gelek aliyan ve sûdê ji dewleta Kurdistanê wergire û wiha dibêje: "Piştî îlankirina serxwebûnê ji bo ewlehî û aştiya herêmê dê Hikûmeta Kurdistanê berpirsiyar be. Ev yek jî di serî de wê li gor berjewendiyên Îranê be. Dewleta Kurdistanê were îlan kirin, dê Kurdên li parçeyên din jî bi awayekî xwezayî bigihîjin aramiyê. Kurd ê bibêjin ' Êdî dewleteke min jî heye' û wê nekevin pey ceribandinên din." Dr. Evdilhekîm Xesro axaftina xwe bi van hevokan bi dawî dike: "Stratejiya Herêma Kurdistanê zelal e. Ev stratejî ji bo aştî û aramiya herêmê ye, ev yek jî li gor berjewendiyên Îran û Tirkiyeyê ye. Bi saya vê yekê Herêma Kurdistanê dikare him ji bo Kurdên li parçeyên din him jî ji bo dewletên cîran roleke erenî bilîze."

Prof. Dr. Cebar Qadir:

Pêşmerge, Kerkûk ji DAİŞê parast

DIYAR EZÎZ MISTEFA

Weke pisporekî, nêrîna we ji bo danasîna Netewî-Nîştîmanî ya Kerkûkê di derbarê dîrok û belgenameyan de çi ye?

Prof. Dr. Cebar Qadir: Nasnameya Kerkûkê ji aliyê dîrokî, erdnigariya xwezayî û mirovî ve Kurdistanî ye, bi wateyeke din, di dirêjahiya dîrokê de beşeke ji wê erdnigariyê bûye ku bi Kurdistanê hatiye naskirin û ji destpêka qirnên serdema navîn ve Kerkûk beşek ji Herema Çiyan bûye.

Di serdema Osmanî de navenda wilayeteke Kurdî ya bi navê Şarezûrê bûye. Ji bilî niştecihên wê yên Kurd û beşeke ji Xiristiyanan, ewên din hemû di demên cuda yên dîrokê de hatine Kerkûkê. Destpêka bi komî ya hatina Ereban ji bo bajarê Kerkûkê dizivire bi hewlên peydakirina Petrolê û firotina Petrolê. Di serdema desthilatdariya Baas jî, anîna Ereban bûye siyaseteke fermî ya dewletê, ji bo Erebkirina bajarê Kerkûkê.

Dîroka hatina Tirkmanan jibo Kerkûkê gelek kevn e. Beşek ji Xiristiyanan jî, nexasim Asûrî piştî qirkirina Ermeniyan di serdema Împaratoriya Osmanî de û bi armanca derxistina Petrolê li Kerkûkê, hatine bicih kirin û di Kompaniyên Petrolê de hatine damezrandin. Ev jî di demekî de ye ku tu dokumentên dîrokî behsa wê nakin ku Kurd ji cihekî din hatibin Kerkûkê. Heta nîvê qirna 19'an Kerkûk beşek bûye ji wargeha Mîrên Kurdî yên weke Erdelan û Baban. Di vir de nasnameya Kerkûkê nayê niqaşkirin.

Weke çavkaniyên pêbawer belge û nexşe û argûman çine ku Kerkûk weke beşeke ji axa Kûrdistanê nîşan kiriye?

Prof. Dr. Cebar Qadir: Gelek çavkanî û dokumentên dîrokî hene. Eger temaşayî her nexşeyekî zanistî bikî dibînî ku Kerkûk xistine nava Kurdistanê de. Beriya ku hestên netewî yên radîkal û nijadperestî pêş bikevin û hewla jinavbirina Kurd û Kurdistanê di dîrok û nexşeya cîhanê de were dayîn, nexşeyên dewleta Osmanî gelek bi zelalî Kerkûkê di çarçoveya Kurdistanê de nîşan dane. Nexşeya Ewropa ya beriya çarsed salan li ber destê me ye ku tê de Kerkûk di nava Kurdistanê de hatiye danîn.

Her torîstekî qirna serdema navîn, dîroka nû û serdemî jî ku serdana vê xakê kirine, dema ku gihiştine Çiyayê Hemrîn nîşan bi wê kirine ku êdî ji vir şûn de xaka Kurdistanê destpê dike.(Çiyayê Hemrîn dikeve 100 km bajarê Kerkûkê). Her wiha, hindek ji torîstan jî, ji Şareban ve qala xaka Kurdistanê kirine.

Mijara nasnameya Kerkûkê ji destpêka qirna derbasbûyî de cihê gotûbêjan nebûye, belkû piştî derxistina Petrolê û firotina wê, hewlên guhertina nasname û piştre guherîna demografiya Kerkûkê destpê kiriye.

Gelo siyaseta dûrxistin û guhertîna demografiyê ku desthilatdariya Iraqê di dirêjahiya dîroka xwe de li hember Kerkûkê û heremên din kirine, qet ji rastî, resenî û giraniya nasnameya Kerkûkê kêm dike yan na?

Prof. Dr.Cebar Qadir: Helbet wê siyasetê ziyaneke mezin gihandiye peykerê civakî û demografiya wî bajarî, sîma û rûçkê wê gûhertiye. Kerkûk, ji bajêrekî serdemî û rêkûpêk vegeriyaye gundekî mezin û bê serûber.

Desthilata xwînmij ya Baas zêdetir ji bîst taxên mezin bi navên xerîb ji Erebên bicihkirî çêkir. Navê Tax, Dibistan, Yane û Bazar û Dikanan jî guherî, weke mînak dixwest navê Taxa Rehîmava bike Endolês, navê Dibistana Kurdistanê kir Dibistana Ebdulmelîkê Kurê Merwan, navê Bajarê Kerkê kir Te'mîm. Li tevahiyê bajar û cihên stratêjîk wargehên niştecîbûnê ji bo Erebên ku ji derve anîbûn çêdikir. Li parelelê wê de, bi sedan gundên Kurdî wêran kir û xelkê wê ji bajar dûr xist yan jî di dema Enfalê de, li biyabanên Başûr de zîndeçal dikirin. Pêvajoya derxistina gelê Kurd ji Kerkûkê bi qasî 40 salan dewam kiriye. Di wan çil salan de, yek Kurd jî di nav bajar de nekirin karmendê dewletê, her tim ew dişandin bajarên din yên Kurdistan û Iraqê. Baas bi wê yekê jî nesekinî, belkî di heman demê de cihên giring yên bajarê Kerkûkê qut dikir û ew girêdida bi bajarê din ve. Bajarokê Kifrî xistin ser bajarê Diyala, Xûrmatû xistin ser bajarê Selahedîn, Çemçemal û Kelar jî xistin ser Silêmaniyê, bajarokê Pirdê jî her di navbera Hewlêr û Kerkûkê de dihat û diçû. Bi vî awayî roj bi roj hijmara şêniyên Kerkûkê ji Kurdan kêm kirin. Her wiha bi van biryarên hikûmetê jî, Kerkûkê nîvê axa xwe ji dest da û ji 20,000 km çargoşe bû kêmtir ji 10,000 km çargoşe.

Madeya 58'an ya zagona rêveberiya demkî ya hikûmeta Birîmer taybet bû bi Kerkûk û heremên din yên Kurdistanê, çima nehate bicihkirin? Rola Amerîka di paşxistina çareserî û yekalînekirina pirsgirêka Kerkûk û deverên din de çi bû?

Prof. Dr.Cebar Qadir: Desthilata dagirkarî ya Amerîka li Iraqê di sala yekem de amade nebû guh bide kesî, bi serkêşî serederî dikir û zimanê gef li hember daxwaziyên rewa yên xelkê bikar dianî û li hember wan pirsgirêk û aloziyên ku derdiketin daxwaz ji Kurdan dikir nermiyê nişan bidin û pirsgirêkan ji wê zêdetir aloztir nekin.Yek ji wan pirsgirêkên mezin mijara deverên Kurdî yên derveyî Herema Kurdistanê bûn.

Bi alozbûna rewşa ewlekariya Iraqê û zêdebûna tûndûtûjîyên mezhebî û êrişên hêzên Amerîka, daxwaza derketin ji wê rewşa kaotîk ya Iraqê bû bijardeyek biqewet. Di vir de hikûmeta Berêmer nedikarî tû pirsgirêkekî çareser bike û tenê hizra wê dikirin ku çawa ji Iraqê derkevin. Ew made bi awayekî hate dariştin ku bibe mijareke dûrûdirêj û serêş û derfeta destêwerdanê jî têde hebe. Ez bawer dikim peymanên Amerîka bi welatên weke Tirkiye û Erebistana Siûdî û Misîr hwd, ji bo parastina yekîtiya axa Iraqê û rê nedan bi statûyeke Kurdistanî, di madeya 58'an de veşartiye. Ji ber kû hemû kesî dizanî ku bi vegera Kerkûkê bo ser Herema Kurdistanê, egera serxwebûna Kurdan, bihêztir dike.

Biryar bû di dîroka 31-12-2007 de tevahiya qonaxên madeya 140'î were bicîkirin, lê ev 10 sal di ser wê de derbas dibe, sedemên bicînekirina wan çi ne, kî berpirsyar e?

Prof. Dr. Cebar Qadir: Bi dereceya yekê hikûmeta Iraqê berpirsyare, jiber ku di madeyê de bi ronî qala bicîkirinê ji aliyê hikûmetê ve hatiye kirin. Lê hikûmetê bi tu awayî hewldana bicîkirina wê nedaye, berovajî wê astengî ji bo bicîkirina wê derxistiye.

Nûnerên Amerîkî jî hinekî berpirsyar in di dariştin û bicînekirina madeya 140'î de. Karbidestên Kurd jî helbet nikarin xwe ji berpirsiyartiyê dûr bixin li hember bicînekirina wê madeyê de.

Eger bersiva we ew be ku karbidestên Kurd erkên xwe bi başî pêk neanîne, wê demê hûn liser wê gotinê çi dibêjin ku berpirsên Kurd di bin zextên Amerîkayê de ew made imze kirine?

Prof. Dr. Cebar Qadir: Ez dibêjim ku berpirsên Kurd xweşbîn bûn û bi hêsanî bawerî bi deste û grûpên siyasî yên Iraqê kirine, ew jî bacek mezin bû li ser Kurdan. Helbet berpirsên Kurd ku weke hevalbendên Amerîka dihatin naskirin, li jêr zextên wan de hatin neçarkirin di hinek biryar û mijaran de razî bin ku di dawiyê de bi zerera Kurdan temam bûne.

Hûn bilindkirina Ala Kurdistanê li Kerkûkê çawa dinirxînin?

Prof. Dr.Cebar Qadir: Ez bilindkirina Ala Kurdistanê li Kerkûkê weke mafekî rewa û qanûnî yê Kurd dizanim û bi temamî piştgiriya wê dikim. Eger mafê Iraqê heye ala xwe li Kerkûkê bilind bike, mafê Kurdan ji wan zêdetir e ku ala xwe li Kerkûkê bilind bike. Dema ku hêzên Iraqî Kerkûk ji DAIŞê re hiştin, Hêzên Pêşmergên Kurdistanê û Asayişa Bajêr ew dever parastin. Ya din jî, ew kesên ku li dijî wê yekê ne ku Kerkûk vegere ser Herema Kurdistanê ewqas bihêz nînin, lewra dixwazin bi riya welatên cîran çavsorî bi Kurdan bikin. Lewma ez dibêjim, tenê yekêtiya hêzên siyasî û civaka Kurdistanê, dikare bibe garantiya parastinê li hember wan gefan.

> PROF. DR. CEBAR QADIR
>
> Di vê hevdîtina BAS'ê de, Prof. Dr. Cebar Qadir, di dîroka serdemî ya Kurd de, qala dîroka Kerkûkê û çawaniya hewldanên hikûmetên Iraqê ji bo guherîna demografiya bajarê Kerkûkê dike û qala dîroka bilindkirina Ala Kurdistanê dike.

We di nivîsekî xwe de gotiye ku ew Ala Kurdistanê ye ne ku tenê ya Herema Kurdistanê ye. Hûn di wir de rexne li rewşenbîrên Kurd digirin ku hê jî Ala Rengîn tenê weke ya Herema Kurdistanê dibînin.!?

Prof. Dr. Cebar Qadir: Belê ew tekane Ala Kurdistanê ye û li gor belgeyên dîrokî mirov dibîne ku vaye sed sal e ku Kurdan ew al bilind kirine. Ji Komeleya Taalî ya Kurdistanê heta Partiya Azadî û Xoybûn û Komara Kurdistanê û heta digihîje îro, ew al bilind kirine. Ewên ku wê alê ala xwe nabînin ji du aliyan ve şaşitî kirin, ji aliyekî ve agahdarê dîrok û netewa xwe nînin û ji aliyê din ve ala partî û sazî û ala nîştîman û netewî ji hev cûda nakin. Ji ber wê yekê jî şewitandina her alekî di cî de nine.

Guherîna demografiyê çi xeteriyê li ser jinavbirina nasnameya bajêrekî dike?

Prof. Dr. Cebar Qadir: Dîrok û erdnigarî ji gelan re gelek giring e û weke nasnameya welat û gelekî tên naskirin. Em jî weke Kurd qurbaniyên velvîna xelkên biyanî ne ku, bi zorê axa me dagir kirin û sîma û rûçikên bajar û avahiyên me gûhertin. Ez dikarim bêjim ku pêvajoya Erebkirina Kerkûkê cûdatir e ji velvîna normal ya xelkê, ji gundan bo nav bajar, jibo jiyaneke baş û destkeftinên xizmetguzariyê.

Hinek kes û alî hene îddîa dikin ku bilindkirina alê li Kerkûkê senaryoya partiyeke siyasî ye, belkû dibêjin ew projeya serxwebûna Kûrdistanê jî ku tê qalkirin, pilana dijminan û welatên dagirker e, hûn çi dibêjin li ser van nêrînan?

Prof. Dr. Cebar Qadir: Em dizanin ku hevrikiya siyasî û hizbî li Kûrdistanê di çi rewşeke xerab de derbas dibe. Partî û grûpên siyasî kêmtir bawerî bi hev dikin. Zimanekî tûnd li dijî hev bikar tînin. Tevî wê rewşê jî, ji min re girane ku hemwelatiyekî Kurd li dijî bilindkirina Ala Kûrdistanê be li Kerkûkê. Helbet gelek başe ku tû ajandayek hizbî li pişt wî karî nebe, lê eger ew jî têde be, ez her bi erka xwe dizanim piştgîrî lê bikim û cihê şermezariyê ye kû Kurdek bêje serxwebûna Kûrdistanê pilana dijminê Iraqê ye. Eger pilan be ew pilana Kurdan e, jiber ku ew Kurd e kû dixwaze weke gel û netew, Kûrdistaneke serbixwe ava bike. Bilindkirina alê, pêkanîna referandûmê û ragihandina dewleta serbixwe ya Kurdistanê xewna Kurdan e û heta ku Kurdek hebe ew xewn jî dê zîndî bimîne.

Dibêjin Tirkmanên Kerkûkê û derdora wê, kî hikûmdariya wan bike bila bike tu pirsgirêk nine, bila zalim û sitemkar jî be, lêbelê ya giring ew e ku ew hikûmdar ne Kurd be; ev gotin çiqasî rast e?

Prof. Dr. Cebar Qadir: Ez nikarim qala hemû Tirkmanan bikim, gelek kes hene ku dixwazin jiyaneke asayî û bêarîşe bijîn. Em dikarin bi giştî Tirkmanên Kerkûkê bikin du beş. Yên ku Şia nasnameya wan e mezheba wan ji bo wan giringtir e, ew tevlî projeyên partî û grûpên Şiayên Iraqê bûne û çarenivîsa xwe bi wan ve girê dane. Beşa din ji mezheba Sunî ne, di nav wan de çendîn partî û rêxistinên cuda hene. Di nav wan de, Eniya Tirkmanî ji yên din çalaktir û dengbilindtir e. Eniya Tirkmanê Iraqî, berê di destê MITê de bû, nêzikahiya wan li hember Kurdan çawa bûya, Eniya Tirkmanî jî bi heman awayî tevdigeriya. Pişt re di dema Ahmet Davutoğlu de ew doz veguhestin ji Wezareta Derve re û bi pêşveçûna têkiliyên aborî yên Tirkiye û Herema Kurdistanê dengê wan hinekî nizm bû. Dest ji wê berda ku itîrafê bi hikûmet û Herema Kurdistanê bike û hewl da ku her çawa dibe endamek û xwe bigehîne Parlementoya Kûrdistanê. Niha ew endamê wan ji aliyekî sonda zagonî xwariye ku berjewendiyên gelê Kurdistanê biparêze, lê ji aliyekî din ve li dijî bilindkirina Ala Kurdistanê li Kerkûkê ye ku ew jî krokiya berjewendiya gelê Kurdistanê ye, lewma li gor min wî kesî mercên endamtiya xwe di parlementoya Kurdistanê ji dest daye.

> Dîrok û erdnigarî ji gelan re gelek giring e û weke nasnameya welat û gelekî tên naskirin. Em jî weke Kurd qurbaniyên velvîna xelkên biyanî ne ku, bi zorê axa me dagir kirin û sîma û rûçikên bajar û avahiyên me gûhertin.

> Ji Komeleya Taalî ya Kurdistanê heta Partiya Azadî û Xoybûn û Komara Kurdistanê û heta digihîje îro, ew al bilind kirine. Ewên ku wê alê ala xwe nabînin ji du aliyan ve şaşitî kirin, ji aliyekî ve agahdarê dîrok û netewa xwe nînin û ji aliyê din ve ala partî û sazî û ala nîştîman û netewî ji hev cûda nakin..

MADEYA 140'Î DI RASTIYÊ DE CÛREYEK JI ZILMÊ BÛYE JI KURDISTANÎBÛNA KERKÛKÊ Û NASNAMEYA WÊ

Ew made, tejîiye ji zilm û bêdadmendî ji bo Kurdên Kerkûkê û deverên din ên derveyî Herema Kurdistanê.

Beriya her tişî îtîrafnekirina partî û grûpên siyasî yên Erebên Iraqê bi tawana bi Erebkirin û qirkirina nijadî ya Kurd li Kerkûkê û deverên din, weke helwesta nemirovane û dijî Kurd yên karbidest nû dizanim, ji ber kû tawanên Baas di wan deveran de bi veşartî nebûye ku di rastiya wan de şik û guman hebe.

Di nivîsên fermî yên hikûmeta Iraqê ji bo saziyên hizbî û dewletê de, daxwaz ji hemwlatiyên Ereb dihate kirin, ew kesên ku dixwazin nav û nasnameya xwe ji bo bajarê Kerkûkê vegûhezin, dê hikûmet parçeyek erd û deh hezar Dînar bide wan û eger karmendên hikûmetê jî bin, dê di saziyên Kerkûkê de werin bicihkirin û ewên ku ne karmendin jî, dê derfeta karkirina wan di kompaniyên Petrolê û kompaniyên din de, saziyên ewlekariyê û hizbî de, ji wan re bidin kirin. Ji ber wê siyasetê bi deh hezaran kesan berê xwe dane Kerkûkê û zêdetir ji 20 tax ji wan re hatin çêkirin. Li derveyî bajar jî, bi hezaran malbatên Ereb li ser zevî û erdên Kurdan hatin bicîkirin û cotkarên Kurd ji wan deran derxistin, ewên man jî, bûn paleyên kirêgirtî di parzîngehên berê li cem xwedanên xwe yên biyaniyên nû.

Reqa di bin siya gengeşiya DYA û Rûsyayê de ma

DERYA KILIÇ

DEWLETÊN Yekbûyî yên Amerîkayê (DYA) piştî îdiayên 'bikaranîna çekên kîmyevî', êrişî Baregeha Şayratê kir û vê yekê jî gengeşiya di navbera DYA û Rûsya de rakir pîleyeke jortir. Pê re jî rûdanên li Rojava û Reqayê di bin siya vê mijarê de man. Îdiayeke din jî ew bû ku DYA, baregahên xwe yên li Rojava; Rûsya jî baregeha xwe ya Efrînê xurt dike.

Li aliyê din Hêzên Sûrîyeyê yön Demokratik (HDS) ku YPG serkêşiya wê dike, di 12 Nîsanê de rêya Şam û Reqqayê qût kirin û kontrola vê derê bi dest xistin. Bi vî awayî merheleya 3'mîn ya operasyona ku di meha Sibatê de dest pê kiribû bi dawî bû. Pey re qonaxa 4. dest pê kir.

Qonaxa 4'mîn Reqayê dest pê kir

Fermandariya Giştî ya Odeya Çalakiyan a Xezeba Feratê di 13 Nîsanê de bi awayekî nivîskî ragihand ku hêzên wan dest bi pêngava 4emîn a Operasyona Xezeba Firatê ya li dijî DAIŞê kirine.

Di destpêka daxûyaniyê de wiha gotin: "Bi navê Fermandariya Giştî ya Odeya Çalakiyan a Xezeba Firatê, em pêngava 4emîn a Xezeba Firatê radigihînin. Di vê pêngavê de, wê temamê bejahiya bakurê Reqayê û geliyê Celab ji çeteyên DAIŞê were rizgarkirin."

Di derbarê aliyên ku beşdarî qonaxa çarem a operasyonê dibin û her wiha derbarê armanca operasyonê de jî hate diyarkirin ku: "Pêngava 4emîn bi beşdariya gelek hêzên ku di bin sîwaneya HSDê de tev digerin û bi piştevaniya Hêzên Koalisyona Navnetewî dest pê dike. Şervanên HSDê bi baskên rojhilat û rojava ber bi Reqayê ve diçin û wê Celabê û gundewarên bakurê Reqayê rizgar bikin."

Herwiha di berdewamiya daxuyaniyê de ji xelkê herêmê xwastin ku di şerê li dijî DAIŞê de alîkariyê bidin şervanên HSDê û soza vê yekê bidin ku dê bajarê Reqayê bi tememî ji DAIŞê were rizgar kirin.

Gelo polîtîkayên DYAyê yên li Sûriyê guherîn?

Piştî êrişa DYAyê pirsên wekî 'Gelo DYA polîtîkayên xwe yên li Sûriyê guhertin? Rewşa YPGê dê çawa bibe?" hatin rojevê. Pisporên Rojhilata Navîn bûn du beşan. Daxuyaniyên rayedarên DYAyê jî serê raya giştî tevlihev kir. Çerçoveya daxuyaniyên navbihûrî wiha ne;

"Karê me yê pêşîn DAIŞ e"

Wezirê Derve yê DYA Rex Tillerson di 9 Nisanê de beşdarî bernameya TV ya CBSê bû û di derbarê polîtîkayên xwe yên li Sûriyê de wisa got: "Berî gişkê armanca me têkçûna DAIŞ e. Bi têkbirina rêxistinê û bi rakirina 'hilafetê' hem herêm dê bibe xwediyê îstiqrarê û hem jî gefên li dijî DYA û herêmê dê ji holê rabin. Piştî ku ev gef ji holê rabûn yan jî kêm bûn, em dê hemû bala xwe bidin ser rewşa Sûriyê û istîqrara wê."

Wezirê Beravaniyê yê DYA Jim Mattis da zanîn ku pêşaniyên DYA li Sûriyê neguherîn û tunekirina DAIŞê hê jî pêşaniya wan e. Mattis got: "Polîtîkayên DYA li Sûriyê neguherîn."

Tillerson di daxuyaniya xwe ya çapemeniyê ku bi Wezirê Karên Derve Mevlüt Çavuşoğlu re di 30 Adarê de di derbarê Esad de wisa got: "(Mayîn û çûyina Esad) biryara wê dê xelkên Sûriyê bidin." Nûnera Daîmi ya DYAyê li Neteweyên Yekbûyî (NY) Nikki Haley ve Berdevkê Qesra Sipî Sean Spicer diyar kirin ku çûyina Esad êdî pêşaniya wan nîn e.

DYA: Me bi xeletî li HSD xist

Li aliyê din li gor daxuniyên ku ji aliyê Pentagon û HSDê ve hatine dayin; firokên asimanî yên DYA di 11 Nîsanê de, di operasyona Tebqaya navçeya Reqayê de bi xeletî li HSDê xist û di encama vê de 18 leşkerên HSDê mirin. Hêzên Hevpeymanê di vê mijarê de daxuyaniyeke hevpar ragihandin û wisa gotin; "Êrişa asîmanî hevalbendên me ji me xwastin. Firokên asmanî guman kir ku ew DAIŞ in. Lê piştre diyar bû ku HSD li wê dere ye." Berdevka Giştî ya Odeya Çalakiyan a Xezeba Feratê û Fermandarê HSDê Cihan Şex Ehmed diyar kir ku Hêzên Hevpeymaniyê bi xeletî li HSDê xistiye.

Iraq û Sûriyê nêzikê hev dibin?

Rojnamegerê Iraqê Mustafa Saadoun di maqeleya xwe ya Al-Monîtorê de îdia kir ku Iraq ji bo hêzên xwe li Sûriyê zêde bike amedekariyê dike. Hevkariya rejima Sûriyê û Iraqê di warê leşkerî de zêde dibe. Saadoun ji bo vê minakek wisa dide; Firokên asmanî yên Iraqê di 24ê Sibatê de yekem car li El Bukemal û Derez Zorê li DAIŞê xistin.

Berdevkê Pentagonê Fermadar Jeff Davis di daxuyaniya xwe ya 24ê Sibatê de derbarê vê de wisa got: "Pentagon, derbarê operasyonên Sûriyê de Iraq agahdar kir û bi Iraqê re istihbarat parve kirin. Operasyonên asmanî bi ser ket û bi awayekî serkeftî li DAIŞê xistin.

Herwiha daxuyaniyên Şam û Bexdadê û nêzîkbûna wan jî gelek balkeş e. Ji aliyê din ve piştî ku rejima Helebê ji destê muxalifan bi dest xist, pêşiya xwe da Deyrez Zor û Reqayê.

Saadoun di meqeleya xwe da cih da vê zanyariyê jî: rojnameya El Alemê di nivîseke xwe de cih dabû çavkaniyeke leşkerî û aşkere kiribû ku DYA ji bo rizgarkirina parêzgeha Reqayê, ji Wezirê Iraqê Heydar El Ebadî alikarî xwastiye. Heger ev îdia rast be, Tirkiyê êdî alternatîf nîn e û heger Bexda qebûl bike, Iraq dê beşdarî operasyona Reqayê bibe.

Koçberên Ereb diçin aliyê Rojava

Niştecihên Herêma Şehba û derdorên wê, ji ber şer koçî Efrînê dikin. Çavkaniyên Xwecihî derbarê vê de agahî dan Heftenameya Basê û diyar kirin ku li wan deran şer berdewam e û xelkên herêmê koçî Kantona Efrînê dikin. Rayedarên Rêveberiya Xweser ê koçberan li her du kampên Efrînê bi cih dikin. Lê rewşa koçberan gelek xerab e û ji bo berdewamkirina jiyana xwe li benda alîkariyê ne. Herwiha rewşa sivîlên Reqayê jî ne diyar e. NY ragihandibû ku ji bo sivîlên Reqayê bi metîrsî ne û li benda koçberiyeke mezin in.

Aya Tirkiyê ji bo operasyoneke nû amedekariyê dike?

Her wiha Mertala Feratê bi dawî bû. Lê Serokwezîr Binali Yıldırım û Serokkomar Recep Tayyip Erdoğan di axaftina xwe de destnîşan kirin ku amedekariya operasyoneke din dikin. Çavkaniyên herêmê îdia kirin ku rûdanên Reqayê dê vê operasyonê diyar bikin. Nûnerê Rojnameya Milliyetê yê Enqereyê Serpil Çevikcan di nivîsa xwe de diyar kir ku Artêşa Tirkiyê dê piştî referandûmê li Şengal û Minbicê dest bi operasyonê bike.

"Hejmara leşkerên Rûsyayê li Efrînê pir hindik in."

Hevseroka Meclisa Kantona Efrînê Hêvî Mustafa piştî êrişa DYAyê rûdanên Rojava û Reqayê ji Heftanameya Basê re nirxand û wisa axivî: "Di navbera hemû hêzên ku li Sûriyê de ne, her tim alozî û gengeşî hebû û vê her tim berdewam kir. Êrişa DYA, aloziya ku di navbera Rûsya û DYA de hebû, derxist holê. Vê ti bandor li ser şoreşa Rojava û têkoşîna li dijî terorê nekir. Em destûr nadin ku ti rûdan bandorê li ser operasyona Reqayê bikin.

Mustafa derbarê hebûna leşkerên Rûsyayê li Efrinê de axivî û da zanîn ku hejmara leşkerên Rûsyayê li Efrînê pir hindik in. Li vê derê tenê bûroya wan heye û ev der ji bo hêzên ku li hemberî hev şer dikin, li hev bikin, tê bi kar anîn.

Mustafa pirsa 'Piştî rizgarkirinê dê rêveberiya Reqayê çawa bibe" wisa bersivand: "Çawa herêmên din hatin rizgar kirin û pişt re xelkên wê derê biryara rêbeveriya xwe bi xwe dan, li Reqayê jî heman tişt dê bibe. Xelk dê biryara rêveberiya xwe bi xwe bide."

"Ez bawer nakim ku êrişa DYA bandorê li ser Kurdan bike"

Serokê ENKSê li Qamişlo derbarê êrişa DYA û bandora wê ya li ser Kurdan de wisa got: "Ez bawer nakim ku êrişa DYA bandorê li ser Kurdan bike. Kêşeya herî mezin ev e ku Kurd nikarin yekîtiyê çê bikin. Heger kurd bikaribin yekîtiyekê çê bikin, hem di têkoşîna li dijî terorê de û hem jî li ser her çar parçeyên Kurdistanê wê serbikevin."

"Pêdiviya wan bi karta Kurd heye"

Akademisyênê Zanîngeha Sdneyê Tim Anderson êrişa DYAyê li Şayratê ji Heftenameya Basê re nirxand û wisa got: "Li gorî min DYA ev êriş ji ber polîtîka û aloziyên xwe yên navxweyî pêk anî. Ji ber ku digotin navbera Trump û Rûsyayê gelek baş e. Trump xwast rê li ber wan gotinan bigire. Hegerna, Trump nedixwast êrişî vê derê bike. Lewra Tillerson çû Moskoyê û her du aliyan li hev kirin. Herwiha ez bawer nakim ku ev bandorê li ser polîtkayên DYAyê yê YPG/HSDê bike û polîtîkayên wê biguhere. DYA ji bo parçekirin û lawazkirina Sûriyê hêzên Kurd bi kar tîne. DYA ji bo parçekirina Sûriyê planin saz kirine.

Anderson bi vê amaje kir ku ew bawer nake ku ev êrîş guhertinên mezin çê bike. Tim Anderson axaftina xwe wisa domand: "Polîtîkayên rêveberiya Trump yên li Sûriyê weke berê ne û berdewam dike. Dema ku ev planên xwe pêk tînin pêdiviya wan bi 'karta' Kurd heye. "

Anderson piştevaniya Tirkiyê ya ji bo êrişê jî nirxand û aşkere kir ku divê Enqere li ser polîtîkayên xwe yên li Sûriyê careke din bifikire û wan binirxîne. Dema ku DYA dev ji şerê weqaleta Sûriyê berde, pêdiviya Tirkiyê bi Rûsya, Îran û Sûriyê heye. Lewra divê istiqrarek hebe. Anderson axaftina xwe wisa qedand: "Ez bawer nakim herêmeke ku ji firînê re qedexê bê saz kirin. Divê Libyayeka din nebe. Ji ber ku ev gelek xeter e. Dibe ku Rûsya û DYA li ser herêmeke 'bêşer' li hev bikin.

Referandom dê çi tesîrê li çarenûsa Kurdan bike?

HILAL YAĞIZ

TIRKIYE, di 16ê Nîsanê de cara 8'mîn ji bo referandomê çû ser sindoqan. Vê carê 18 madeyên destûrê û pergala ku bi navê "Pergala Hikûmeta Serokkomariyê" tê zanîn ji aliyê gel ve bi sedî 51ê dengên 'Erê' hat pejirandin. Di pêvajoya referandomê de tişta herî zêde li ser nîqaş hate kirin jî hilbijêrên Kurd bûn. Hin aliyan serkeftina dengên erê bi dengên Kurdan ve girê dan. Hin aliyan jî encama serkeftina dengên erê wek bingeha ji nû ve destpêkirina pêvajoya çareseriya ku ji aliyê Erdogan ve hatibû rawestandin nirxand. Di vê çarçoveyê de encama referandomê ya li bajarên Kurdan wê tesîreke çawa li ser helwesta Tirkiyê ya li hemberî proseya referandoma serxwebûna Kurdistanê bike.

"Di nav Kurdan de tevgereke nû dê derkeve"

Rojnameger Îlhamî Işık, encama referandomê wek têkçûnekê dinirxîne û dibeje ku dê pêvajoya çareseriyê ji nû ve destpê bike. Işik dibeje ku divê Tirkiye di proseya aştiyane de li çareseriyekê bigere û axaftina xwe wiha domand: "Ji 7ê Hezîrana 2015'an û vir ve di mijara çareseriya pirsgirêka Kurd de hewlên siyasî didomin. Her çiqas PKK hewlên siyasî di xendekan de veşartibe jî gelê Kurd di 16ê Nîsanê de berê xwe da sindoqan û got 'em çareserkirina pirsgirêkan bi rê û rêbazên siyasî dixwazin. Işık balê dikişîne ser vê yekê û dibêje; "Li seranserê Bakurê Kurdistanê AKPê dengê xwe ji sedî 10 zêde kiriye. Ev jî dide xuya kirin ku hûn destê xwe direjî Kurdan bikin û wan guhdarî bikin dê baweriya Kurdan ji bo çareserkirina pirsgirêkan bi rêbazên demokratîk zêdetir bibe. Hikûmeta Tirkiyeyê tenê dikaribû xwe bigihîne ewçend zêdebûnê. Heger hîkûmetê bikaribûya zêdetir xwe bigihanda Kurdan wê rêjeya dengan gelek zêdetir bûya. Zêdebûna rêjeya dengên erê di nav Kurdan de bû sîgorta encama referandomê ji bo 'Erê'.

Erdoğan, mînaka ETA dide û pê de diçe: "Eger çek were danîn û tûndî were rawestandin her tişt dê were axaftin û nirxandin. Hemû gav dê werin avêtin." Siyaset ji bo van tiştan e. Ez wisa bawer dikim ku dê Kurd wê li hember tûndrewî û çekperestiyê bisekinin. Wisa difikirim ku di nav Kurdan de tevgerên sivîl û demokratîk zehftir wê cîh bigirin. Helbet ev zehmet e. Li aliyekî hebûna PKK, şertên rêxistinî, zêdebûna tundî, ji aliyê din ve jî nêrîna dewletê û li gel hemû zehmetiyan Kurd mecbûr in ji ber ku li Başur ev îspat kirin. Başûr da ber çava ku rêya pêşketin û bidestxistna maf ne tûndrewî ye. Neyîna mihatap ne mimkin e. Hebûna Kurdan ji bo mihatap girtinê bes e. Pirsgirêk ew e ku mirov bi awayekî siyasî Kurdan derxîne asta temsîlyetê. Di hêla temsîlyetê de pirsgirêk heye. Divê mirov baweriyê bi aqil, dil, ûcdan, ehlaq û hebûna Kurdan bîne."

"Encama referandomê ji bo Kurdan hewayekî erênî diafirîne"

Mamosteyê Zaningeha Dîcleyê Dç. Dr. Vahap Coşkun dibêje encama referandomê ne suprîz e. Coşkun, di destpêkê de serkeftina referandomê ji bo pêvajoya çareseriyê rewşeke erênî biafirîne jî mînakên lêgerîna hevsengiya hêzî ya li Suriyeyê dê tesîra xwe li rewşê bike.

Coşkun di derbarê pêvajoya çareseriyê û referandomê de wiha diaxive:

Dengên 'Erê' yên ji bajarên Kurdan tesîreke mezin li encama referadomê kir. Koalîsyona AKP û Partiya Neteweperestên Tirk têra serkeftina referandomê nekir lê dengên Kurdan yên ku gotin erê gihîşte hawara wan. Her wiha Erdoğan di axaftina xwe ya piştî ancama referandomê de bal dikşîne van dengan û têbinî bi pêvajoyeke nû dike. "Her çiqas rexne û li hember derketina Kurdan ji bo vê destûra bingehîn hebe jî Kurdan piştgirî da AK Partiyê. Her wiha tepkiya Kurdan ji PKK re ji ber şerên xendekan hîn didome. Dema mirov li 7ê Hezîranê û 16 Nîsanê dinêre piştgirya Kurdan ji bo HDP her ku diçe kêm dibe.

Dibe ku serkeftina bi piştgiriya dengên Kurdan hewayeke erênî biafirîne. Lê mebesta gotina rêyên nû ne bi encama referandomê ye. Yek ji xalên girîng rewşa li Suriyê ye. Heta li Suriyeyê çareseriyek dernekeve holê pêvajoyeke nû zehmet e. Jixwe Erdoğan jî di beşdariyeke televîzyonekê de ev yek vekirî anî zimên. Pêvajoya çareseriyê bi çekberdana PKK ve girê da. Di vê mijarê de jî gav avêtina PKK ji bo hewlên nû dibe ku deriyekî veke. Ji bilî vê yekê jî li gor encama vê referandomê pêvajoyeke nû zehmet e."

Coşkun, li ser helwesta Tirkiyeyê a li ser proseya serxwebûna Herêma Kurdistanê de jî amaje pê kir ku; Tirkiye, piştî pejirandina cîhanê li hember serxwebûnê nasekine. Gumanek nîne ku dê têkiliyên her du aliyan dewam bikin û ez ne bawer im Tirkiye li dij serxwebuna Herêma Kurdistanê bisekine.

PERGAL DÊ KENGÎ BIGÛHERE?

Ji bendên ku dengdan li ser hatiye kirin û hatine pesendkirin, endamtiya Serokkomar a partiyê, sererastkirina Lijneya Dozger û Dadgeran û rakirina daraza leşkerî dê demildest û bendên din jî wê piştî hilbijartinên 2019an bên cîbicîkirin. Li gorî vê yekê dadgehên leşkerî dê werin jinavbirin. Herwiha ji aliyê hiqûqî ve astengiyek li pêşiya pêkanîna hilbijartinên pêşwext jî nîn e.

"KURDAN PÊŞBÎNIYA DESTPÊKIRINA PROSEYEKE NÛ KIRIN"

Şêwirmendê Ahmet Davutoğlu yê Berê Rojnameger Etyen Mahçupyan di wê hizrê de ye ku encamên referandûmê dê di nava AKP'ê de bibe sedema niqaşan û lêbelê sedema veqetîn an belavbûnekê. Mahçupyan herwiha dibêje ku di van şert û mercan de destpêkirina proseyeke nû ne pêkan e û wiha dewam dike: "Kurdên ku di nava AKP de ne dîsa li gor siyaseta partiya xwe dengên xwe bikar anîn, lêbelê dengderên HDP helweseteke protestoyî nîşan dan. An jî beşeke HDPyiyan pêşbînîkirin ku dê bi anîna pergala nû û derketina dengê 'Erê' proseyeke nû destpê bike. Lê di van şertan de destpêkirina proseyeke nû ne pêkan e. Niha AK Partiyeke ku mehkûmê MHP'ê ye heye. Li Sûriyê hatin dawiya riyê. Pêwendiyên PYD û DYAyê yên li wê derê li holê ne. Ji ber wê yekê heta hilbajartinên pêşiya me ne mumkune ku vegerin proseya berê. Heta ku îhtîmal heye ku berovajî wê rewş xerabtir jî bibe."

HOŞENG OSÊ

"Şoreşa Rojava"
...
Şevreşa Rojava

"Şevreş"a PKK-PYDê digel afirandina faşîzma partî û îdolojîk, cureyeke ji "nivîsxwar" û "rewşenhevîr" gendelhez û kirêgirî peya kiriye ku kiryar û binpêkirinên vê "şoreş-şevreşê" xweşik û meqyaj dikin yan çavên xwe jê digirin.

Li gorî PKK-PYDê tiştên li Sûriyê di 15ê Adara 2011an de rûdan ne şoreş e û li gorî behaneya wan; şoreş gerek bi serok be û divê partiyeke şoreşger û îdolojiya wê ya şoreşger hebe û ev tişt di rûdawên Sûriyê de peyda nabin. Helbet ev nêrîn yan ev têgihiştin derbarê têgeh yan diyardeya şoreşa, Lenînîst e û ji bîr û boçûnên klasîk yên çepgiriyê tê, çawa ku V. Lenîn dibêje: "Tu liv û tevgereke şoreşgerî nînin, bêy ku tewrî û partiyeke şoreşgerî hebe". Lê dema ku rêjîma Beşar Esed di 19 tîrmeha 2013an de beşek ji deshilatiya herêma rojavayê Kurdistanê da PKK-PYDê, van biradera navê wê kirin "Şoreşa Rojava", tevlî ku rejîma Esed ta niha li Qamişlo û hemû bajarên rojavayê Kurdistanê heye. Ev birader ji xwe napirisin, li gorî bîr û boçûnên çepgirî, ev çi şoreşe ku digel yan jî di himbêza rejîmeke faşîst û dîktator de dijî û digel vê rejîmê di nava hevkarî û peywendiyan de ye?

Û ji ber ku "dengê daholê ji dûr ve xweş e", gelek kes bi propagandeya demagojî ya PKK-PYDê hatin xapandin û ji wan wê ye ku "Rojava" ya Apociya ne gul û gulistan û behişta azadî, demokrasî, dadwerî, wekhevî û ya mafên jinê ye. Lê ji bo tu delavên demokrasî û azadiya raman û derbirînê li cem PKK-PYDê qam bikî û bipîvî, divê tevlî vê rêxistinê bibî û çend mehan yan salekê di nav de bimînî û piştre jê veqetî û rexne bikî, wê çaxê dê baş nasbikî bê PKK-PYDê çiqas demokrat in.

Di pêvajoya 30-40 salên şer, pevçûn û tekoşîna di navbera PKKê û dewleta tirk de, ne rejîma 12ê Îlonê ne jî hemû hukûmetên Tirkiyê, nasnama hemwelatiyê ji serokê PKKê Abdullah Ocalan kişandin, tevlî ku wî bi serokê "rêxistina terorê" bi nav dikirin. Ocalan dema hate girtin, weke hemwelatiyekî Tirk hat dadgeh kirin. Di navbera van 30-40 salî de tu carî rejîma Tirk ji dayik, xwîşk û birê Ocalan re ne gotin: "Herin lawikê xwe îqna bikin bere dest ji vî karî (terorê) berde. Eger bernede, emê we dersînor bikin û dest deynin ser milk û malên we".

Eynî mesele derbarê hemû endamên PKKê, çi biçûk çi mezin, tu carî nehatiye gotin ku rejîma Tirk çûye gefan li malbatên wan xwariye û ji wan re gotiye; yan hunê zarokên xwe ji çiyê vegerînin malê? Yan emê we dersînor bikin û bişînin cem zarokên we û dest deynin ser mal û milkên we. Lê tiştên ku dewleta Tirk bi serê malbatên endamên PKKê nekiriye, niha PKK-PYDê bi serê malbatên pêşmergeyên rojava dike. Deshilatiya "Şevreşa" rojava diçe gef û çavsoriyan li malbat û xizmên endamên pêşmergeyên rojava dike û ji wan re dibêje: "Yan zarokên we wê dest ji çetetiya Erdogan berdin, yan emê we bişînin cem wan û dest deynin ser mal û milkê we".

Dêmek demokrasiya desthilata PKK-PYDê ewqas bilind bûye ku êdî gihîştiye asta faşîzmê. Ev desthilatdarî û bi rêya alavên ragihandina xwe ve, faşîzmeke civakî, siyasî û îdolojîk di nava gel de belav kiriye û çandiye ku tenê tu du saetan li qenala televizyona PYDê "Ronahî" temaş bikî, dê heste li ba te peyda bibe ku eger tu kesek PDKeyî li kolanê bibînî, tê bixwazî wî bikujî.

Ev "şoreş"a Apociyan wisa lê hatiye ku roja hemwelatiyên Kurd kiriye şevreş û jehrî. Şoreş û welat di çavên xelkê de reş kiriye.

"Şevreş"a PKK-PYDê digel afirandina faşîzma partî û îdolojîk, cureyeke ji "nivîsxwar" û "rewşenhevîr" gendelhez û kirêgirî peya kiriye ku kiryar û binpêkirinên vê "şoreş-şevreşê" xweşik û meqyaj dikin yan çavên xwe jê digirin. Ev "şoreş-şevreş"a PKK-PYDê êdî hiştiye milet xweziya xwe bi dema rejîma Baasê bînê.

Berî vê "şoreş-şevreşê", PKK-PYDê qerf û tinazên xwe bi PDKê dikirin, ku çawa ji dewlet, hikûmet û ragihandina Tirkiyê re qebûl dikin ku ji Kurdistana Başûr re bêjin: "Bakurê Iraqê - Kuzey Irak". Lê piştî "şoreş-şevreş"a PKK-PYDê û bê şerm û fedî ev rêxistina "şevreşgerî" navê rojavayê Kurdistanê kiriye "Bakurê Sûriye" û di rojnameya xwe a fermî "Serxwebûn"ê de dinivîsîne.

Roja Rojnamegeriya Kurdî pîroz be

EKREM ÖNEN

Dî vê nivîsê de dixwazim behsa hindek ji aspektên dîrokî yê rojnamegeriya Kurdî bikim da neslê nû bizanibe rojnamegeriya Kurdî di rewşek çawa zehmet de derbas bûye. Dema mirov li protsesa destpêk û guhertinên dîrokî yên rojnamegeriyê li welatên cîhanê dinêre mirov dibîne ku her welat di qonaxên cuda de derbas bûne. Bes tevî van tiştan tevan jî mirov dikare ji bo tevaya welatan protsesek unîversal bikarbîne ku hemû welat têde derbas bûne an hîn dibin. Evê ya mirov dikare bi vî awayî bide diyar kirin. Li hemû welatan sê qonaxên ku rojnamegerî têde derbas bune hene. 1- Qonaxa rojnamegeriya partiya, 2- Rojnamegeriya profesyonal, 3- Rojnamegeriya komersial (ticarî).

Bêdewletî û perçebûna Kurdistanê nehêla ev her sê qonax bi awayekî xwezayî (evolution) li Kurdistanê pêk werin. Rojnamegeriya Kurdî di dawiya qirnê XIXan de destpê dike. Piştî ku li Awrûpa fikra netewî belav dibe bi teybet piştî şoreşa Fransa her weha sedsala dawî a împaratoriya Osmanî ku gelek lawaz dibe, miletê dibin destê împaratoriya Osmanî de jî şuûra netewî bi wan re xûrt dibe û yek li pê yekî (li Cezîra Erebî, Balqan û Afrîqa) dest bi şerê azadiyê dikin ku jibin destê împaratoriya Osmanî rizgar bibin. Piştî serhildana Bedirxaniyan 1847an li hember împaratoriya Osmanî ku biserneket, Osmaniyan Bedirxanî surgûnî Misrê kirin. Yek ji mezintirîn rewşenbîrê Kurd Miqdad Bedirxan di sala 1898an de li paytexta Misrê Qahîre biryara weşana rojnameya Kurdistan digre û di 22ê nîsana 1898an de hejmara 1ê a rojnameya Kurdistan çap dike. Rojnameya Kurdistan ji ber zordariya Osmanî jîyana xwe heta 1902an dewam kir û 31 hejmar derket.

> Li hemû welatan sê qonaxên ku rojnamegerî têde derbas bune hene. 1- Qonaxa rojnamegeriya partiya, 2- Rojnamegeriya profesyonal, 3- Rojnamegeriya komersial (ticarî). Bêdewletî û perçebûna Kurdistanê nehêla ev her sê qonax bi awayekî xwezayî (evolution) li Kurdistanê pêk werin.

Piştî girtina rojnameya Kurdistan di sala 1908an de "Kurd Teavûn ve Terakî Cemiyeti" hate avakirin, piştre bi demek kin rojnama Kurd Teavûn ve Terakî Gazetesi derket. Xwediyê rojnamê Suleymaniyeli M. Tewfîk bû. Nivîskarê wê Bedîûzeman Seîdê Kurdî, Diyarbekirli Ehmed Cemîl, Seyid Abdulkadir, Babanzade Îsmail Hakki, Erzîncanli Hamdi Süleyman, Haydarîzâde Îbrahîm Efendi, Malatyalî Bedrî û gelek rewşenbîrên Kurd. Vê rojnamê jîyana xwe 9 meha dewam kir û bêhtir nivîskarê wê hatin girtin. Di heman demê de rojnama "Şark ve Kurdistan" dest bi weşanê dike. Rojname ji alî van kesan de hatiye derxistin: Hersekli Ahmed Şerîf, Malatyali Bedrî, Hersekli Îsmail, Bedîûzaman Seîdê Kurdî. Di sala 1913an de kovara Kürt Talebe Cemiyeti Hêvî, Rojî Kurd dest bi weşanê dike. Rojî Kurd kovarek mehane bû û 4 hejmar derxistine, revebirê kovarê Süleymaniyeli Abdulkerîm e her weha kesên wek Abdullah Cevdet, Harputlu H. B, M. Salih Bedirxan û gelek rewşenbîrên Kurd têde dinivîsandin. Vê kovarê du meh û nîvan karîbûye xwe bigre paşe weşana wê jî hatiye sekinandin. Di heman demê de cemiyeta teleba a Kurd parelel bi kovara Rojî Kurd re rojnama Yekbûn derdixistin Yekbûn wê demê her sê rojan carekê derdiket û kovarê xwe durî siyasetê dikir. Mudurê giştî ê rojnamê Îbrahîm Kurdî bû. Nivîskarên rojnamê M. Salih Bedirxan, F. N., M. H. ve M. S. Azîzî bûn.

Di sala 1913an de kovara Hetawî Kurd dest bi weşanê dike. Wek fermî ji alî Hamza yê Muksî û Abdulazîz Baban hatiye weşandin nivîskarê wê: Babanzâde Îsmaîl Hakkı, Abdullah Cevdet, Kerküklüzade Kerîm Ahmed Muhsin, Bitlisli Şahab Malver, Mûhâmmed Mihrî, Diyarbekirli Fikrî Necdet, Harputlu H. B., Süleymaniyeli Îsmaîl Hakkı, Mewlânâzade Rifat, Kerküklü Rasih, Cizreli Molla Ahmed, Siirtli Molla Halîl Efendi, Mesud, Mardinli Mehmed Nurî, Bavê Naco, Mustafa Şevkî, Süleyman Asaf, Süleymaniyeli Zafer, Şeyh Hamza, Halîl Modanî Zahavîzade E.M., Îbrahim Heraluş û Zeko, Manisadan Kürt Kızı Kevser. Di sala 1918an de kovara"Jîn" hate çap kirin. Kovara Jîn 25 hejmar derketiye. Bi Kurdî bi zaravayên Kurmancî û Soranî her weha bi Tirkî weşan dikirin. Berpisyariya kovarê Memduh Selîm Beg û Hemzeyê Muksî kiriye nivîskarên kovarê jî ev in: Süleymaniyeli Tevfîk, Siverekli Hilmî, Halîl Hayalî, Abdurrahman Rahmî, Kemal Fevzî, Azîz Yalmukî, Lawê Reşîd, Îhsan Nurî, Kamuran Ali Bedirxan, Qadîzâde Mustafa Şevkî, Hiznî Dersimî, Mina Cezirî, Qadîzâde Latif Zaxoyî, Şefîk Arvasî, Kurdîzâde Kemal Bey, Dr. Abdullah Cevdet, Bedîûzeman Saîdê Nursî, Bitlisli Yüzbaşı Emin, Süleymaniyeli Mevlüd, Süleymaniyeli Babanzâde Nurî ve Süleymaniyeli Reşîd Bey. Jîn piştî hejamar xwe ya 25an di sala1919an weşana wê bi dawî hatiye. Di sala 1922an de li Başûrê Kurdistanê Bangî Kurdistan dest bi weşanê kir, Bangî Kurdistan bi Kurdî, Tirkî û Farisî weşan dikir. Berpirsê rojnamê Mîrlîwa Hacî Mustafa Yalmukî Paşa ye berpirsê Tirkî Refîk Hilmî ye û berpirsê Farisî Elî Kemale. Bangî Kurdistan heta sala 1926an weşan kir. Paşe di 26ê adara sala 1930î de li Sovyetê bajarê Rewanê rojnama Rîya Taze bi Kurdî dest bi weşanê kir her çiqas carna navber ketibe weşana wê ji, lê emrê wê dirêjtirîn rojnama Kurdî tê hesêb. Di serdema me de rojnamegeriya Kurdî di rewşeke nû de ye, niha gelek rojname, kovar û qanalên tv û radyoyan hene. Bi vê munasebetê Roja Rojnamegerîya Kurdî pîroz be.



Dr. Sapan: Ragihandina Kurdî Hizbî Tevdigere

DARAYÊ PORXELEK

Rojnamegeriya Kurdî ku ji dewletbûnê bêpar e û em dikarin bibêjin bêxwedî ye li her çar parçeyên Kurdistanê jî her tim di bin zext û zordariyên gelek mezin û tund de hewl daye ku dengê Kurdan hem bigihîne cîhanê û hem jî bigihîne wan bi xwe. Ji bo Kurd weke hemû miletên cîhanê bibin xwedî dezgeh û ragihandinekê, gelek berdêl dane û didin jî. Li her çar perçeyan jî dagirkerên Kurdistanê di vî warî de rê nedaye ku Kurd bi awayekî azad û serbest nêrîn, derd û kulên xwe bînin ziman. Lêbelê tevî hemû astengî, zext û zordariyan jî Kurdan karîn ji xwe re ku em dikarin bibêjin 'Ragihandina Kurdî' ava bikin.

> Akademîsyen Sapan destnîşan dike ku ragihandina Kurdî bi şêweyekî giştî ragihandina hizbî ye û dibêje ku fikrên hizbayetî ji bo dewletbûn û pêşketinê karîgeriyeke baş nakin û ji ber vê yekê jî rojnamegeriya Kurdî karê xwe bi başî û bi rêk û pêk bicih nayîne."

Rojnameya 'Kurdistanê' ku yekem rojnameya Kurdî ye, weke ku me amaje pê kir ji ber ji welat û dewleteke azad bêpar bû, di 22yê Avrêla 1898an li derveyî welatê xwe, li Kahîreya Misrê ji aliyê dildarê Kurdî Mikdad Midhat Bedirxan ve hat derxistin û ew roj weke 'Roja Rojnamegeriya Kurdî' tê pîroz kirin. Bi vê helkeftê Akademîsyênê Zankoya Selahedînê Dr. Megdad Sapan li ser rewşa Rojnamegeriya Kurdî ya li her çar perçeyên Kurdistanê, sansûra di medyaya Kurdî de, ragihandina yekalî ango hizbî û kar û peywirên dikevin ser ragihandina Kurdî ku Kurd li Başûrê Kurdistanê ber bi dewletbûnê ve diçin ji Rojnameya me re axivî.

Akademîsyen Megdad Sapan amaje bi wê yekê dike ku hikûmetên navendî li pêşîya rojnamegeriya Kurdî gelek kêşe û astengiyan derdixin ku Kurd dezgehên xwe yên rojnamegeriyê ku bi azadî tê de dinîvisin ava nekin. Qanûn û destûrên tund çêdikin ku bikaribin Kurdan bi hêsanî derxin pêş dadgehên xwe û wiha pê de çû: "Li welatekî weke Îranê ku xebatên bi vî awayî qedexe ne û nahêle ku malperên komaleyetî weşanan bike gelo wê çawa destûr bide ku Kurd rojnameyeke bi zimanê Kurdî derxin."

"Civakên pêşkewtî bindestiyê qebul nakin"

Dr. Sapan di derbarê rewşa rojnamegeriya Kurdî de jî diyar dike ku başî û xirabiyên rojnamegeriya Kurdî girêdayî rewşa siyasî ya li her çar perçeyên Kurdistanê ye û radigihîne ku eger li perçeyekî azadî nebe bêguman rojnamegerî jî xirab dibe. Sapan dibêje ragihandinê pêwendî rasterast bi civakê ve heye û wiha didomîne: "Civakên pêşkewtî bindestiyê qebul nakin. Ji ber vê yekê hikûmetên navendî hewl didin ku Kurd her tim bindest bimînin û ji bindestiyê rizgar nebin ku ew jî bikarin bi rehetî dewlemendî û samanên Kurdistanê talan bikin û bikin bazara kelûpelên xwe. Ev astengî û kêşeyên mezin in ku bûne sedema rewşa xerab ya ragihandina Kurdî."

"Şer û nexweşî bûne asteng"

Megdad Sapan destnîşan dike ku hebûna ragihandineke baş pêdivî bi jîngeheke aram heye û wiha didomîne gotinên xwe: "Ew jîngehên aram li Kurdistanê tune ne. Mixabin li çar perçeyên Kurdistanê çil sal e şerekî mezin li dijî tevgerên rizgarîxwaziya Kurd heye û hê jî berdewam e. Ji ber vê jî ragihandina Kurdî nikare gelek tiştan bike. Ev şer û nexweşî bûye asteng li pêş rojnamegerî û akademiyê ku pêş bikeve."

"Bingeheke xurt li Bakur heye"

Akademîsyen Megdad Sepan di derbarê rewşa çapemeniya Kurdî ya li Bakûrê Kurdistanê ku piştî îlankirina rewşa awarte bi dehan sazî û dezgehên Kurdî hatin girtin de jî nêrînên xwe tîne ziman û diyar dike ku ev sed sal e rewşa Kurd û dezgehên wan qet baş nebûye û pêşiya Kurdan her tim hatiye girtin ku dezgehên xwe vekin û bi serbestî qala êş û azarên xwe bikin. Sapan bi van hevokan dawî li gotinên xwe tîne: "Derketina kovar û rojnameyan bi zimanî Kurdî pêşketinek zor baş e. Lêbelê niha rewş xerabtir bûye û her çiqas rewş her tim ji bo rojnamegerên Kurd xerabtir be jî niha ji bo dezgehên Tirkî jî rewş xerab e. Tevî vê yekê jî bingeheke ragihandinê ya baş li Bakûrê Kurdistanê heye."

"Du cûre sansûr hene"

Akademîsyen Megdad Sapan li ser sansûr û manîpulasyona di dezgehên ragihandinê yên Kurdî de jî wiha dibêje: "Wextê ku welat aram nebe û desthilatên leşkerî welat birêve bibin, bêguman ragehandin wê ne azad be û wê sansûr li ser ragihandinê hebe." Sapan qala du cûre sansûran dike û dibêje yek bi destê desthilatên navendî pêk tê û bi destûran sînorên ragihandinê diyar dikin û ev destûr pêşiyê li azadiya dezgehên ragihandinê yên biçûk digire. Sapan di berdewamiya gotinên xwe de qala sansûra duyem dike û diyar dike ku ev cûre sansûr jî ew e ku rojnameger xwe bi xwe sansûr dike û newêre bi awayekî azad nêrînên xwe bîne ziman û binivîse."

"Ragihandina Kurdî karê xwe baş pêk nayîne"

Akademîsyen Sapan destnîşan dike ku ragihandina Kurdî bi şêweyekî giştî ragihandina hizbî ye û dibêje ku fikrên hizbayetî ji bo dewletbûn û pêşketinê karîgeriyeke baş nakin û ji ber vê yekê jî rojnamegeriya Kurdî karê xwe bi başî û bi rêk û pêk bicih nayîne."

Di derbarê rewşa medyaya Kurdî ya li Rojavayê Kurdistanê de jî Sapan radigihîne ku Hikûmeta Herêma Kurdistanê di vî warî de jî gelek alîkarî û piştgirî daye Kurdan û dibêje; "Lêbelê rewşa şer ya li wî perçeyê kar girantir dike û divê dezgehên ragihandinê yên Rojavayê Kurdistanê jî li gorî berjewendiyên netewî tev bigerin."

"Rewş tenê di dema Komara Kurdistanê de baş bû"

Di dirêjiya gotara xwe de Dr. Megdad Sapan li ser rewşa ragihandina Rojhilatê Kurdistanê jî dike û wiha berdewam dike: "Li seranserê Îranê rewşa siyasî gelek xirab e. Azadî û demokrasî ji bo tu kes û neteweyan tune ye. Kurd jî yek ji wan gelan e ku rê li ber tê girtin. Heta niha zarokên Kurd ji perwerdehiya zimanê Kurdî bêpar in. Ji ber vê yekê rojnamegeriya Kurdî li Rojhilatê Kurdistanê tenê di demên Komara Kurdistanê de baş bû û piştre hertim xerab bûye."

Rojnamegerên Kurd:

Divê em li gor rêzikên cihanê tevbigerin

MURAT ÖZDEMİR

"Cihgirtina zêde ya nûçeyên propagandayî, rê li ber manîpûlasyonê jî vedike. Bi vî awayî dezgehên Kurdî pêbaweriya xwe winda dikin. Divê dezgehên Kurdî li gor rêz û rêzikên rojnamegeriya cîhanê tevbigerin ku cîhan jî guh bide dengê Kurdan."

ROJNAMEGERÎ li hemû cîhanê xwedî cihekî girîng e û her tim ev girîngiya xwe parastiye. Lêbelê ji bo netewên weke me Kurdan ku bêdewlet in û di nava xebat û têkoşîna rizgariyê de ne rojnamegerî zêdetir girîng dibe, peywir û berpirsyariyên mezin li xwe digire. Nemaze jî di vê serdema ku Rojhilata Navîn tê re derbas dibe û miletê Kurd ber bi dewletbûnê ve diçe de dezgehên rojnamegeriyê xwedî berpirsyariyeke mezin in.

Rojnamegerên Kurd jî bi helkefta 'Roja Rojnamegeriya Kurdî' ku her sal 22yê Nîsanê tê pîrozkirin li ser mijarên rewşa rojnamegeriya Kurdî ya berê û niha, manîpulasyona di dezgehên ragihandinê de, zêdebûna zextên li ser rojnamegeriya Kurdî û peywîr, helwest û berpirsyariyên ku dikevin ser milên dezgehên ragihandinê li hember serxwebûna Kurdistanê, ji rojnameya me re axivîn.

Mahmut Bozarslan: Dezgehên Kurdî peywîra xwe bicih nayînin

Rojnameger Mahmut Bozarslan di destpêka axiftina xwe de salên 90'î û serdema niha dide ber hev û dibêje, tenê cudahiyek heye di navbera herdu heyaman de û wiha pê de diçe: "Berê gelek kuştin çêdibûn, rojnameger dihatin qetilkirin. Baş e ku niha kiryarên wisa ne zêde ne. Lêbelê niha jî weke berê şert û mercên xebatê gelek dijwar in. Bi girtênên dawîn jî xwastin dengê Kurdan qut bikin."

Rojnameger Bozarslan li ser manpîlûsyona di hin dezgehên Kurdî de jî wiha diaxive: "Cihgirtina zêde ya nûçeyên propagandayî, rê li ber manîpûlasyonê jî vedike. Bi vî awayî dezgehên Kurdî pêbaweriya xwe winda dikin. Divê dezgehên Kurdî li gor rêz û rêzikên rojnamegeriya cîhanê tevbigerin ku cîhan jî guh bide dengê Kurdan."

Bozarslan helwest û nêzîkahiya ragihandina Kurdî ya li hember hewldan û xebatên referandûma serxwebûna Kurdistanê û dewletbûna Kurdî jî şîrove dike û radigihîne ku di vî warî de ragihandina Kurdî peywîra xwe bicih nayîne û wiha dewam dike: "Sedema vê yekê jî ew e ku platformeke serbixwe ya ragihandinê tune ye. Ji sedî 90'ê dezgehên Kurdî li gor polîtîkaya partiyeke siyasî û îdeolojîk tevdigerin. Eger rewş wiha berdewam bike ne mimkun e ku di mesele û berjewendiyên netewî de helwesteke yekgirtî pêk bê."

Faruk Balıkçı: Rewşa niha ji ya berê gelek xerabtir e

Rojnameger Faruk Balıkçı rewş û şert û mercên rojnamegeriya Kurdî ya niha baş nabîne û dibêje, ji salên berê gelek xerabtir e û wiha didomîne: "Salên 90'î jî li ser rojnamegerên Kurd zextên dijwar hebûn lêbelê wê demê ev vaşartî dikirin. Rojnameger dihatin qetilkirin. Rojname dihatin girtin. Lê dîsa jî rojnamegeran dikarîn xwe bigihînin gelek tişt û agahiyan û qasî îro astengî nedidîtin." Balıkçı dibêje di serdema niha de ew rûyê dewletê yê li bin erdê û veşartî niha derketiye ser rûyê erdê û bi awayekî zelal û aşkere ew kiryarên berê tên kirin. Balıkçı di dewama axaftina xwe de radigihîne ku ji ber van sedeman rewşa niha ji ya berê gelek dijwartir e û gotinên xwe wiha bi dawî dike: "Dezgehên Kurdî bi awayekî rehet tên girtin. Di heyema Komara Tirkiyê de serdemeke ku qasî niha rojnameger di zîndanan de bin tune ye. Di rewşa niha de ne tenê Kurd hemû aliyên muxalîf ketine ber zextan."

Sertaç Kayar: Divê berjewendiyên netewî li ber çavan bên girtin

Rojnameger Sertaç Kayar bibîr dixe ku rojnamegerên Kurd her tim rastî zext û zordariyan hatine û wiha pê de diçe: "Bi îlankirina rewşa awarte re şert û merc dijwartir bûn û gelek dezgehên Kurdî hatin girtin. Li gor rewşa siyasî helwesta li hember ragihandina Kurdî jî digûhere. Ji bo ku naxwazin rastî derkevin holê dengê ragihandina muxalîf û nemaze jî ya Kurdî tê qutkirin."

Kayar aşkere dike ku divê rojnamegerî girêdayî tu hêzan nebe û divê tenê pişta xwe bi xelkê ve girêbide. Kayar wiha dewam dike: "Gelek caran rikberiyeke tund di navbera dezgehên ragihandinê de rû didin û ji ber vê yekê jî berjewendiyên netewî li ber çavan nayên girtin. Kîjan sazî jî be dema ku ket destê rêxistineke siyasî wê bêalîbûna xwe winda bike."

Kayar di derbarê helwesta dezgehên Kurdî ya li hemberî mijara referandûma serxwebûna Kurdistanê û dewletbûna Kurdan de jî destnîşan dike ku divê dezgehên Kurdî ya ku dikeve ser milên wê bicih bîne û berjwendiyên netewî li ber çavan bigire. Kayar wiha dibêje: "Ev meseleyeke netewî ye û di ser partî û rêxistinan re ye. Ji ber wê yekê divê saziyên Kurdî di vî warî de bi baldarî û hesasîyeteke zêde tevbigerin. Lêbelê mixabin di vî warî de kêm dimînin."

Ömer Faruk Baran: Kêmasiya herî mezin bêdewletbûn e

Rojnameger Ömer Faruk Baran jî amaje bi wê yekê dike ku kêmasiya herî mezin nebûna ragihandineke netewî ye û dide xuyakirin heta ku dezgeheke dewletê neyê avakirin kêşeya manîpûlasyonê wê zêde be di dezgehên Kurdî de. Baran diyar dike dema ku partiyên siyasî ji bo berjewendiyên Kurdan helwesta xwe kirin yek û di vî warî de yekgirtinek ava kirin wê çaxê dibe ku dezgehên Kurd jî li gor berjewendiyên netewî tev bigerin û herwiha dibêje ku ev niha weke xeyalekê ye.

Baran herwiha di derbarê referandûma serxwebûna Kurdistanê de jî helwesta dezgehên ragihandinê yên Kurdî rexne dike û dibêje ku ev mesele qasî ku bi tu partiyan ve neyê girêdan girîng e û divê ev li ber çavan bê girtin. Baran axaftina xwe wiha bi dawî dike: "Mesela serxwebûnê gelek girîng e. Ev mesele di ser partiyan re ye. Lêbelê mixabin helwesta ew dezgehên ku girêdayî rêxistin û partiyên siyasî ne gelek xerab e."

Murat Bayram: Sînorên heyî bi saya ragihandinê ji holê rabûn

Rojanameger Murat Bayram jî li ser rewşa dezgehên rojnamegeriyê yên Kurdî destnîşan dike ku aliyên neyînî û erênî hene û wiha pê de diçe: "Kêşeya herî mezin a dezgehên Kurdî xwe weke ku xîtabî hemû civaka Kurdan dikin nîşan didin. Lêbelê di rastiyê de ev ne wisa ye û ew tenê xîtabî beşeke civakê dikin." Bayram dibêje li cîhanê tu dezgehên serbixwe tune ne û wiha dirêjiyê de gotinên xwe: "Rageşiyên li welatên ku Kurd lê dijîn û kêşe û arîşeyên di navbera Kurdan bi xwe de hemû li ser milên ragihandina Kurdî dibin barekî giran û dezgehên Kurdî xwe li ber vî barî ranagirin."

Rojnameger Bayram di berdewamiya axaftina xwe de diyar dike destkeftiya herî baş ew e ku bi riya dezgehên ragihandinê, sînorên di navbera Kurdan de ji holê rabûne, dibêje û pê de diçe: "Bi saya ragihandinê êdî Kurd ji rewşa hev hayîdar dibin û ji geşedanên perçeyên din agahdar dibin û herwiha bi saya ragihandinê zimanekî hevpar ku hemû Kurd ji hev fêm dikin pêk tê. Lêbelê mixabin bêdewletbûn û rewşa darayî ya dezgehên Kurdî bûye sedem ku dezgehên ragihandinê yên Kurdî ji destê partiyên siyasî rizgar nebin."

"Kêmasiya herî mezin nebûna ragihandineke netewî ye û dide xuyakirin heta ku dezgeheke dewletê neyê avakirin kêşeya manîpûlasyonê wê zêde be di dezgehên Kurdî de. Dema ku partiyên siyasî ji bo berjewendiyên Kurdan helwesta xwe kirin yek û di vî warî de yekgirtinek ava kirin wê çaxê dibe ku dezgehên Kurd jî li gor berjewendiyên netewî tev bigerin. Lê ev niha weke xeyalekê ye.

JAN DOST

Rola xayînên wêjeyê

Ne hewce ye mirov dubare bike ku wergerandin avakirina pirên hevnaskirina miletan û zimanan e, ne hewce ye mirov dubare bike ku pêşketina wêjeyan bi wergerandinê dest pê dike. Ji bo wê jî em kurd îro ji her demê bêhtir bi hewceyî "xayînan" in. Em bi hewceyî tevgera "xayîntiyek" hêja û durust in.

Traduttore, traditore

Wateya van du peyvên di serê vê nivîsê de: Wergêr xayîn e. Ew bi zimane îtalî ne û hema hema hemî wergêr, ez jî wek wergêrekî di nav de, van du peyvan dizanin û tim bilêv dikin û heta radeyekê jî ewan herdu peyvan rast dibînin.

Mijara wergerandinê, wergerandina kitêban û bi awayekî zelaltir deq û tekstên edebî ji zû de cihê niqaşa rexnegir, edebzan, nivîskar û wergêran e. Ji zû de, zanayan behsa destpakî û emaneta wergêran kiriye, behsa bêlayeniya wan kiriye û mîna qaîdeyeke zêrîn gotiye ku wergêrê qenc divê tu carî dest nede tekstê, divê teksta orîjînal, deqa eslî wergerîne zimanê din bêyî ku guhertinan tê de bike. Lê di dirêjiya mêjûya edebiyat û wergerê de xuya bû ku ev qaîde yan jî bi peyvek nêîktir ev daxwaz di ser imkanan re ye û pêkanîna wê zor û dijwar e, tu carî dilsozî û wefadariya bi ziman û reng û dengê teksta orîjînal re ne mumkin e. Hîç wergêrek nikare iddia bike ku ewî dest nedaye tekstê. Loma jî zanyaran bala xwe dayê ku wergerandin ne neqilkirina tekstekê ji zimanekî bal bi zimanekî din e lê ew jinûvenivîsîna tekstê bi xwe ye. Ji bo wê jî hemî wergêr mîna xayinan hatin ragihandin. Xayînên deqên edebî û pirtûkên helbestan û romanan. Xayinên hêja.

Gelo heta kîjan radeyê ew xiyanet durust e! Mirovê wergêr divê qenc herdu zimanan bizanibe, zimanê ku jê werdigerîne û zimanê ku lê werdigerînê. Divê qenc bikaribe maniweran di tekstê de bike, eger astengek hat pêşiya wî bizanibe çawa jê derbas be û çivan bide xwe. Lê tu carî ne ji mafê wergêr e ku wateyê biguhere. Ew dikare wêneyekî helbestî wergerîne zimanekî bi awayekî ku li gor wî zimanî û ciwaniya wî zimanî be, wate nayê guhertin lê alavên ciwankarî û belaxet û rewanbêjiyê têne guherandin. Wek mînak; niha eger di romanekê de ev meteloka kurmancî hebe: Zêr zane zor zane devê tivinga mor zane. Gelo divê çawa bête wergerandin! Helbet ku mirov wê wek ku heye wergerîne, dest nede peyvan, hema wan peyvan biqulibîne zimanê din wê tiştekî ecêb û komîk derkeve ku him jê nayê fêmkirin û him jî kenê mirov pê tê. Li vir armanca wergerê pêk nayê. Êdî divê wergêr xayîntiya xwe ya pîroz bike û di zimanê din de lêkolînan bike. Di zimanê wergerê de li metelok û biwêjên nêzîkî wateya wê metelokê bigere û eger yek minasib dît di wergera xwe de tesbît bike. Bi wî awayî xwendevanê zimanê wergerê wê qenc niyeta metnê de fêm bike û bi ser de jî wê pê bihise ku tekstekî ne wergerandî dixwîne. Anku: wergerandin bi ser ket.

Ji xwe xurtiya wergêran di wê yekê de ye ku mirov nizane ewan wergerandin kiriye. Ma me negot ku wergerandin bi xwe jinûvenivîsandin e!

Xayîntiya deqekî edebî, mebest jê ne guherîna xerab e, ne pîskirin û dûrketina ji wateyê ye. Mebest ji xayintiya di wergerê de wek me nivîsî ciwankarî ye, xweşikkirina deqa ku hatiya wergerandin zimanekî din e. Min bi wergêrê dest bi jiyana xwe ya edebî kir. Sala 1991ê yekemîn pirtûka min derket. Komek helbestên kurdî û jiyana helbestvanan min wergeradibû erebî. Wekî din jî min gelek gotar û nivîs derbarî vê mijarê de nivîsîne û gelek wergêr rexne kirine.

Ez sê salan li ser hev beşdarî konferansên navneteweyî ên wergerê bûme, ew li Abû Dabî li dardiketin û min gelek sûd jî ji wan wergirtiye, min gelek kitêb wergerandin erebî, kurdî jî . Bi qasî ku min bala xwe dayê hin wergêrên me ne ku „xayîn" in lê nezan in loma jî wergerên wan seqet in û bê ast in. Ne hewce ye mirov dubare bike ku wergerandin avakirina pirên hevnaskirina miletan û zimanan e, ne hewce ye mirov dubare bike ku pêşketina wêjeyan bi wergerandinê dest pê dike. Ji bo wê jî em kurd îro ji her demê bêhtir bi hewceyî „xayînan" in. Em bi hewceyî tevgera "xayîntiyek" hêja û durust in.

‘Muhteşem Yüzyıl’: Kosem û Keça Mîr Şeref Xan

MURAD CIWAN



Di konferansa li ser Şeref Xan de ya ku li Îstanbulê civiya, beşek li ser hin belgeyên derbarê kuştina Şeref Xanê mîrê Bidlîsê û nivîskarê Şerefnameyê de bû. Berê dihat zanîn ku ew, sala 1603/4an miriye. Lê li gor belgeyên Osmanî yên nuh dîtî, ew di 1601ê de ji bal mîrê mîranê Wanê Osmanî ve hatiye kuştin.

Belgeyên sedemên kuştinê ne li ber dest in, bes hin tez hatin diyar kirin. Pê re, behsanameyeka gerokê îtalî Pietro della Valle bû. Gava ew li Îstanbulê (1615/1616) ye, rastî Xanê Bidlîsê tê ku hatiye ji bo bi temamî vegerandina erdên mîrekiya xwe yên ku ‘demeke kurt berî mirina Nafîz Paşa’ jê hatibûn stendin, pişt re wî beşek vegerandibû. Gelo dibû ku ev buyer bi kuştina Mîr Şeref Xan ve girêdayî be?

Piştî konferansê, ez li ser agahiyên della Valle rawestiyam, min orîjînal ên îtalî derxistin, dan ber yên bi tirkî; hin ferq tê de hebûn. Ew paşayê Osmanî yê bahs kirî, ne Nafîz Paşa, Nasuh Paşa ye û ne demeke kurt berî mirina Nasuh Paşa, bi mirina wî re, ew erd ji Xan hatibûn stendin.

Xanê ku dellaValle pêrgî yê wî bûbû, navê wî nehatibe dayîn jî, divê Ziyaeddînê kurê Şeref Xan be ku piştî kuştina bavê xwe bûbû mîr.

Nasuh Paşa ‘devşîrmeyekî’ arnawudî (yan rum) yê ku di ser gelek postên dewleta Osmanî re derbasbuye, heta sedrezamiyê hilkişiyaye.

Nasuh Paşa di hin seferên ber bi Kurdistanê ve serdarî kiriye, ew buye waliyê Şamê û Helebê. Gava sedrezam Cagalazade Sînan Paşa Heleb da mîrê Kilîsê Huseyîn Canpolat Paşa, Nasuh Paşa razî nebû, lê ew der ji israrê bi cîhişt. Nasuh Paşa mîrê mîraniya Diyarbekirê kir (1606-1612). Peymaneka li hevhatinê li gel Safewîyan kir ku navûdeng da û navê wê bû ‘Peymana Nasuh Paşa’. Ew dost û hevkarekî xurt ê mîrên Kurdistanê bû.

Di wikipediayê de heye ku dema Nasuh Paşa begler begê Diyarbekirê bû bi keça Şeref Xanê hakimê Bidlîsê re zewicî.

Lê tarîxa begler begîtiya wî çend salan piştî kuştina Şeref Xan e. Dema mayina wî ya li Kurdistanê û tarîxa kuştina Şeref Xan li hev nakin.

Min hin agahîyên zelaltir di Tarîxa Naîma de dîtin. Naîma nişan dike ku Nasuh Paşa gava mîrê mîranê Diyarbekirê bû, bi keça Mîr Şeref re zewicî. Di mesela pêwendiyên wî û mîrên Kurdistanê de jî, behsa Mîr Şerefê mîrê Cizîra Botan tê kirin.

Naîma dinivîse ku Mîr Şeref di nav mîrên Kurdistanê de xwedan rêzlêgirtineka diyar bû, bi saya wî, Nasuh Paşa dostî û hevkariya mîrên Kurdistanê kêşa alî xwe. Gava sedrezam Cagalazade Sînan Paşa çû şerê Safewiyan û şikestineka mezin xwar, ji bo gunehkariya xwe veşêre, gazin ji mîrên kurdan kir. Xwedêgiravî ku çima di wextê de negihîştiye ser şer, li Wanê serê mîrê Kilîsê û waliyê Helebê Huseyîn Canpolat jê kir.

Ji ber vê, birazîyê Huseyîn Canpolat; Alî Canpolat li Kilîsê serîhilda.Sînan Paşa alîkarî ji Nasuh Paşa xwest da ew mîrên Kurdistanê bigire, biçe serîhildanê bitemirîne, Nasuh Paşa xwe giran kir. Naîma dibêje çimkî mîrên Kurdistanê hemî ji Sedrezam Sînan Paşa aciz bûbûn.

Mesela Canpolatên kurd çîrokeka dirêj e, em li vê derê dibirin. Bes lazim e bê gotin ku piştî gelek şeran, heta Quyucu Murad Paşa bi eskerekî giran hat ser wan, ji 26 hezaran zêdetir canpolatî ser jêkirin, avêtin bîr û çalan, serîhildan temirî.

Piştre Quyucu bû mîrê mîranê Diyarbekirê, Nasuh Paşa jî li wir bû. Quyucu li Diyarbekirê mir. Îdîayek heye ku Nasuh Paşa ew jehr daye.

Agahiyeka din a ku pirsa zewaca Nasuh Paşa bi keça Mîr Şeref Xan re zelal dike jî, rexneyek e li rêze fîlma‘Muhteşem Yuzyıl: Kosem’ê. Di rêzefîlmê de roleka cariyeyekê heye; Cennet Kalfa (Cennet Hatun). Cariyeyeka li koşka Kosem Sultanê, bi xeyala ku rojekê bibe dayika şehzadeyekî dijî, yekali pey meran e.

Rexneya Melike Chimay e. Ew di bloga xwe de, di rexneya rêzefîlmê de behs dike ku kalikê wê Celal Temrukoglu di berhemeka xwe ya neçapkirî de ya li ser osmaniyan, cih dayê: Piştî hin agahiyên li ser eslê Nasuh Paşa, bilindbûna wî di dezgehên dewleta osmanî de û mîrê mîraniya wî ya Diyarbekirê, wiha dinivîse: “Nasuh Paşa gava li Dîyarbekirê bû di 1606an de, bi keça prensê kurd Mîr Xan; Cennet Xatûnê re zewicî.”

Xwediya blogê rexne li derhêneran digire, ku wan çima Cennet Xatûn di fîlmê de wek ‘cariye’ nîşan daye. Li gor wê, ev texrîfata dîrokî ji ber şoveniya wan tê, ji ber ku Cennet Xatûn keça mîrekî kurd e.

Li gor agahiyên li wir, Nasuh Paşa gava bi Cennet Xatûnê re zewicî ew bi keça Padîşah Mehemedê III. a ji nedîme Sevrenaz Xatûna Sarayî re jî zewicandî bû, zarokên wan jî hebûn. Piştre ku Nasuh Paşa di peymana li gel Safewiyan de navûdeng da, bi keça Sultan Ahmedê I. a ji Kosem Sultanê a binavê Ayşe Sultanê re jî zewicî; keçik 7 salî (di Naîma de 3 salî) bû. Nasuh Paşa, di 1614an de bi fermana Ahmedê I. hat kuştin.

Nexwe, Nasuh Paşa zavayê Mîr Şeref Xanê mîrê Cizîra Botan bû. Ew, Mîr Şerefê III. ye, di 1566 an 1570yî de hatiye dinyayê, di 1596an de bûye mîrê Botan, heta mirina xwe (1626) li ser hukum maye.

Dewra zêrîn a mîrekiya Cizîra Botan dewra vî Mîr Şeref Xanî ye. Ew, hemdemê Şeref Xanê mîrê Bidlîsê ye. Di Şerefnameyê de behsa wî tê kirin. Mîr Şeref Xanê ku Melayê Cizîrî pesnê wî daye û şi’r li serê gotine ew e. Gerçî hê di dema Mela de, Mîr Şerefê IV. Jî tê ser hukum, lê ew neviyê vî mîr Şerefî ye, piştî bavê xwe Mîr Mehemedê IV. hatiye ser desthilatê, lê dewre kaçilmisî jiyaye.

Çîroka zewaca mîrzadeya kurd Cennet Xatûna keça Mîr Şeref Xanê Cizîra Botana li gel Nasuh Paşa û marîfeta derhênerên tirk, nefreta wan a ji kurdan wiha ye.

Li gor agahiyên bi dest xistî, ew erd ne di dema kuştina Şeref Xanê Bidlisî de, lê piştî mirina Nasuh Paşa (1614) ji Ziyaeddîn Xanê kurê wî hatine stendin û bihatina Îstanbulê re lê vegeriyane.

FIRAT CEWERÎ

Kurdên Swêdê û çapemeniya wan

Piştî ku di sala 1943an de dawî li jiyana Hawarê hat, di edebiyata kurdî de bêdengiyeke mezin çêbû. Kurd roj bi roj ji xwe û ji ziman û nasnava xwe bi dûrketin. Her çiqas di salên şêst û heftêyî de li Tirkiyê hin çirûsk pêketibin jî, dîsa pir kêmbû û xurte tevgera kurdan ya salên heftêyî ku dikarîbû bi dehhezaran kurd rakirana ser lingan, bi tirkî bû û jibilî hin çîrokên folklorî û şiîrên qels, piraniya weşanên wan jî her bi tirkîbûne. Ji avakirina komara Tirkiyê û heta salên heyştêyî bi tenê çend kitêbên bi kurdî derneketine. Di wan salan de kurd pir siyasî û hindik kulturîbûn, pir navneteweyî û hindik neteweyîbûn wan zêde guh ne didan ziman û edebiyatê û tiştên, bi gotina wan, “weha piçûk” dihiştin piştî şoreşê. Xwendin, nivîsandin, fikirîn, minaqeşe, kultur û siyaset hemû bi tirkîbûn. Zimanê tirkî bi her awayî li ser kurdan hakim bû. Vê yeka han, heta hatina cûntaya leşkerî ya îlona 1980yî dewam kir.

Hatina cûntayê bû sebeba girtina bi deh hezaran kes û reva bi deh hezaran keç û xortên kurdan. Ew keç û xortên aktîv ku xwe ji ber cûntayê dane alî, li welatên Ewrûpayê belav bûn û gelek ji wan jî li Swêdê bi cihbûn.

Swêd welatekî demokratîk e, li hemberî mafên mirovan bi hurmet e, guh dide jiyana mirovan û azadiya fikrê lê heye. Civateke wilo, sîstemeke wilo ne mimkin e mafên kêm neteweyan, an jî mafên biyaniyên ku lê bi cihbûne bixwe, wan ji azadiya fikrê û ji demokrasiya xwe bê par bihêlin. Loma, kurd jî li Swêdê mîna kurd hatin qebûl kirin, mafên ku ji bo grûbên din yên biyanî hatin qebûl kirin, ji bo kurdan jî derbasbû. Kurdan xwe zû organîze kirin, xwestin ji demokrasî û imkanên Swêdê destkewtî bibin, li biyanistanê nehelin û têk neçin. Li her bajarê ku ew lê bi cihbûn, wan li wir komeleyên çandî avakirin û ew komele bûn cihê hevdîtin û aktîvîteyên wan. Paşê, di sala 1982an de li Stockholmê federasyonek avabû û çi bigire hemû komeleyên kurdan yên li Swêdê di bin sîwana federasyonê de hatin bahev. Federasyon hê jî dijî û li gora xwe xebata xwe didomîne. Piştî federasyonê bi salan, bi ked û xebata Nedim Dağdevirenê rehmetî kitêbxaneya kurdî vebû û kitêbxane jî hê dijî…

Federasyonê bi avakirina xwe re dest bi weşandina kovareke bi navê Berbang kir. Berbang xwerû bi kurdî bû û di pêş de xistina ziman û edebiyata kurdî de roleke ber biçav lîstiye.

Li Swêdê bi dehan kovar û rojnameyên kurdan derketin û van kovaran ne bi tenê di warê siyasî de, lê di warê edebî de jî rolên ber biçav lîstine. Mixabin, mîna pêşiyên xwe gelek ji van kovaran an di wextê xwe de dernediketin, an jî pir temen kurt bûn. Niha bi tenê yek libin ji wan kovaran mane.

Hin ji kovarên kurdan û yên bi kurdî ku li Swêdê derketine bi kurtî ev in:

Armanc (1979, pêşî bi kurdî-tirkî bû, paşê bû bi kurdî). Ayre (1985, bi zazakî û tirkî derketiye), Berbang (1982, bi her sê zaravayên kurdî derketiye) Berhem (1988, kurdî-tirkî) Bergeh (1989, kurdî-tirkî) Berxwedan (1983, kurdî, paşê li Almanyayê çap bû) Çarçira (1986, kurdî) Hêlîn (1982, kovara zarokan, bi kurdî) Hêvî (1981, kovara zarokan, bi kurdî) Hêviya Gel (1986, kurdî-tirkî) Îsot (1985, kovara mîzahî) Koçer (1988, kovara zarokan, bi zaravayê soranî) Kulîlk (1980, kovara zarokan, bi kurdî) Kurdistan Press (1986, kurdî-tirkî) Mamostayê Kurd (1985, kurdî, bi zaravayê soranî) Mîrkut (1985, kovara mîzahî) Niştiman (1983, kurdî-tirkî) Pale (1978, kurdî-tirkî) Pêşeng (1983, kurdî-tirkî) Rênas (1988, kurdî) Rizgariya Kurdistan (1979, kurdî-tirkî) Roja Nû (1979, pêşî kurdî-tirkî, paşê xwerû bi kurdî) Rojev (1991, kurdî-tirkî) Serdemên Nûh (1986, kurdî) Yekîtiya Sosyalîst (1984, kurdî-tirkî), Muzîk û Huner (1980, kurdî) Wan,(..?) Nûdem (1992, kurdî) Nûdem Werger (1996, kurdî) Çira (1995, kurdî) Helwest, Avaşîn (1996, kurdî) Vate (1996, kirdkî), Dugir (1995, kurdî), (Bîrnebûn (1997, kurdî-tirkî) Jîndan (1997, kurdî) Şano û Sînema (1997, kurdî) Roj (1999, kurdî-tirkî) Rabûn (1992, kurdî) Rahand (kurdî, 1996) Gizing (kurdî, …)

Mirov dikare bi hêsanî bibêje ku hem di dema Hawarê de hem jî piştî heyştêyî li Swêdê ya ku ziman û edebiyata kurdî aktuel kir û li ser lingan hişt, kovar in. Lê, di ber kovaran re li Swêdê gelek weşanxaneyên kurdan jî avabûn û van weşanxaneyan di mijarên cihê de bi sedan kitêb derxistin. Hinek ji van weşanxaneyên ku tavilê tên bîra mirov ev in: Jîna Nû, Welat, Deng, Vejîn, Orfeus, Roja Nû, Haykurd, APEC, Rewşen, Sara, Azad, Rabûn, Mamostayê Kurd, Nûdem, Çanda Nûjen…

Mîna kovaran, mixabin, dawî li jiyana weşanxaneyan jî hatiye, lê jiyan berdewam e…

Referendûma Kurdistanê û helwesta Îranê

BEHROOZ SHOJAİ

HERÊMA Kurdistanê ji bo serxwebûnê bi nîyet e gavina biavêje, lê hevsengên herêmî li hember van hengavan kospên ciddî ne. Pêgeha cografîk ya kilîtkirî ya herêma başûrê Kurdistanê welê lê kiriye ku divêt ji bo parastina hebûna xwe, hem wekî herêmeka federal li Iraqê û hem jî wekî yekîneyeka serwer di qalibê dewletê de, bi hindek aktorên herêmî re li hev bike, yan bi kêmanî rêya sazişê bigire. Her çar dewletên Iraq, Îran, Tirkiye û Sûrîye di çarçoveyên netewe-dewletên etnîk yên liser binemayê etnîsîteyeka serdest, hertim li hember hewlên kurdan ji bo serwerîyê li hev civîyane û tenanet li hev jî kirine. Peyaman Cento ya demekî her bi vê mebestê hatibû afrandin. Ev çend dewlet hertim bi qeyrana meşrûîyeta siyasî re rûbirû bûne, lê meşrûîyeta sîyasî ya hikûmetên van welatan ti rojînek ji bo edakirina mafê serwerîya kurdan pêk neanîye. Bi serhildana DAIŞê her du welatên Iraq û Sûrîyê rastî qeyrana meşrûîyeta serwerîyê jî hatin, çima ku DAIŞê sînorên cografyaya sîyasîya van herdu welatan têk da. Di qeyraneka wisa de, bi têkçûna meşrûîyeta serwerîyê li Sûrîye û Iraqê, dergehek jibo derbirrîna meşrûîyeta serwerîya kurdî vebû. Di vê arasteyê de kurdan wekî aktorekê bêdewlet lê bi damûdezgehekê eskerî karîn bibine tenê hêza berengarî li hember tewehuşa DAIŞê. Ji lewre sempatî û empatîya raya giştî ya cîhanê jî ji bo afrandina serwerîyeka kurdî hat meydanê.

Îronî di vir de ye, ku di asta cîhanî de meşrûîyet û rewabûna serwerîya kurdî bi awayekê berfireh dihête palpiştî kirin, lê di astê herêmî de bi astengên ciddî re rûbirû ye, jiber ku serwerîyeka kurdî li başûr, dê qeyrana meşrûîyeta serwerîyê li van welatan biafrîne; her yek ji van welatan xwedî kêmîneyên kurd in. Komara Erebî ya Sûrîyê – yan ya ku ji vê komarê maye – tenanet di haletên herî krîtîk yên şerî de dijberîya xwe ji bo her formeka serwerîya kurdî li wî welatî derbirrîye. Tirkiye li rewşê dinêre û li gor berjewendîyên siyasî-aborî helwêst digire. Iraq alîyê din yê pirsgirêkê ye û her aktorekî vî welatî li nexmeyekê didin. Şîe li hev nakin, lê Dewleta Yasayê helwêsteka nêzîkî ya Komara Îslamî nişan daye. Alîyê sunnî li Iraqê li ser erdê bi kurdan re di nakokîyê de ye, ji lewre hêvîkirina alîkarîyê ji wan estem e. Evca alîyê ku herêma Kurdistanê divêt serederîyê pêre bike Îran e.

Pozîsyona Îranê liser serwerîya kurdî pozîsyoneka statîst, ango dewletgera ye. Li Îranê serwerî di zanavê etnîk yê fars de hatîye hebs kirin û herçî neteweyên din yên Îranê, wekî kurd, ereb û belûç in divêt bê şert û merc vî zanavê etnîk yê serwerîyê qebûl bikin. Ev zanav bi pêbendîya mezhebî di destûra Îranê de jî hatîye mukim kirin. Ango mezheb şîe yê donzdeh îmamî wekî mezhebê resmî yê Îranê dihête nasîn û meqamên payebilind yên hikûmetê divêt tabiî vî mezhebî bin. Hem di teorîyê hem jî di pratîkê de kurdên ne-şîe ji bazinên desthilatê, heta ku ev destûr hebe, mehrûm in. Lê di rastîyê de zanavê etnîk ê kurdan bixwe jî kêşeyek e. Parêzgehên Kurdistanî yên Îlam û Kirmaşanê bi piranî şîe ne, lê gundewarên Kirmaşanê û parêzgeha Îlamê bi giştî di hêla aborî û civakî de parêzgehên herî paşdemayî ne. Ev nîşan dide, ku dewleta Îranê, evca çi şahenşahî be, çi komara îslamî, hertim kurd wekî dîtirin etnîkên xwe dîtine û ew ji derveyî desthilatê hiştine. Eger Îran liser kêmîneya kurdî ya xwe xwedîyê wê helwêst û wê boçûna sîyasî be, gelo dê li hember destkeftên kurdên derveyî sînorên cografyaya sîyasî ya Îranê çewan be. Bêguman Îran dê her teşegirtineka serwerîyê ji bo kurdên cîran wekî gefekê li ser qalibê serwerîya xwe bibîne.

Di hêla dîrokî ve, Kurdistana mezin hertim parçeyek ji Îranê bû. Ya rastî bingehê welatê ku niha Îran e, bapîrê kurdan, ango medan danî. 120 salî piştî damezrandina împaratorîya medan, ku ji xwe re navê Aryan bi kar dianîn, Kûruşê xwarzîyê Astyag, şahê medan li hember kûdetayek kir û dewlet kete destê farsan. Piştî paşayetîya akemenîdan, Îran kete destê Skenderê Makedonî û xanedana Selewkî 300 salî li



Îranê hukim kir. Evca dîsan bapîrekê din yê kurdan bû, ku Îran ji destê selewkîyên helenî derêxist; wate, xanedana pehlewanîyan/partan ku zimanê wan dayka zimanê kurdî ye, ji nû ve Îran vejîyand. Navê xanedanê herçende eşkanî bû, lê ji pantaya ku lê hukim dikirin navê Aryan danîbûn. Dîsan jî 200 piştî zayînê farsan bi hîleyeka din hukim ji destê bapîrê kurdan derêxistin û bingehê xanedana farsî-ziman ya sasanî danîn. Verzîyona farsîya navîn ya navê vî welatî Êran bû ku paşê di farsîya nûjen de bû Îran. Lê berî wan di dema partan de her wekî Aryan dihate bi nav kirin.

Îronîyeka din ew e, ku piştî îslamê û têkçûna Îranê wekî welatekê hevgirtî, dîsan kurd bûn ku bingehê Îrana modern danîn, ango xanedana bi regez kurd, sefewî bûn ku xîmê Îrana modern ya serdema me danîn. Ji wê semeretir ew e, ku piştî hukimdarîya vî xanedana bi esl kurd, çewsandin û dijberîya kurdan jî zêde bû û heta niha jî didome.

Îran dîrokê li gor xwe hildisengîne; kurd hingê ji bo wan giring in, ku bikarin wekî berê sînorên wan biparêzin. Yan na dê li heman çarenivîsa kurdên bo Xorasanê nefîkirî bihên. Qebûlkirin û qebûlnekirina Kurdistaneka serbixwe li başûr ji alîyê Îranê ve bi çend faktoran ve girêdayî ye. Yekem, gelo ka zilhêzên navneteweyî dê li hember Îranê palpiştîya wê bikin yan na? Gelo ka ji bilî hevsengên navneteweyî Kurdistaneka serbixwe li başûr dê bi çi awayî xizmeta berjewendîyên Îranê bike. Ev dihête wê wateyê ku eger zilhêzeka wekî DYAyê piştgîrîyeka aktîv ji bo Kurdistaneka serbixwe bike û garantîya mayîna wê bike, hingê Îran dê bi awayekê pragmatîk helsûkewtê pêre bike, ango dikare tenanet peywendîyên xweş bi wê re dayne, bi mercê ku li ser pêgeha serwerîya wê nebe gef. Heger DYA piştgîrîyê nede Kurdistanê, Îran dê ticarî pasîv nemîne û dê hertiştî jibo tegerexistin li hember serxwebûna Kurdistanê bike.

Giringî û pêwîstiya referandûmê

BÛBÊ ESER

EM Kurd ji roja perçebûna (1639) welatê xwe yê şêrîn, Kurdistana delal û heta ku em bigihêjin azadî û serxwebûna xwe em ê her ber xwe bidin, têbikoşin da ku em mafê xwe bistînin.

Piştî gelek serîhildan, berxwedan û wendakirina şerê azadiya Kurdistanê, demeke dûr û dirêj Kurd ketibûn nava bêdengiyeke bêbinî. Lê ji bona ev bêdengiya qidûmşikestî ji ser kurdan rabe her



Barzaniyê nemir li gel pêşmergeyên xwe di nava tevger û danûstendinê de bû. Tekoşîn û berxwedana Kurdan ya herî talî ku têkçûyî Komara Kurd li Mahabadê bû. Piştî vê têkçûnê, li her çar perçayên kurdistanê bêdnegiya mêrinê girtibû ser Kurdan. Vê him moral, him qidûmê kurdan şikestandibû.

Vê bêqidûmiyê kiribû ku êdî Kurdan newêrîbû dengê xwe derxistana. Bi hal û bendestiya xwe yan bi darê zorê razî bûbûn yan jî mecbûr mabûn vê qebûl bikin.

Lê Barzaniyê nemir ji vî halî ne kêfxweş û ne rehet bû. Plan û proje çê dikir da ku vê bêdengiyê ji ser Kurdan rake û weha jî kir.

Bi gulleya ewil ya îlona 1958 ew bêdengî, ew qidûmkşestî, ew bêmoralî ji ser Kurdan rabû. Vê gulleyê kir ku Kurd ji nû de zîndî bûn, bawerî bi xwe anîn ku divê ew heta ku azad bibe şerê azadiya gelê xwe bidin.

Bi saya şoreşa îlonê û berdewamiya wê ya gulana 1976an û serîrakirina 1992an Kurd piştî demeke dûr û dirêj ji nû de gihişt hin mafên xwe yê rewa…

Êdî serkêşî, pêşevanî û serokatî ketibû destê birêz Mesud Barzanî û ew jî li ser rê û rêbaza bavê xwe, Barzaniyê nemir, meşiya. Ji ber ku wî perwerdehiya xwe ji bavê xwe girtibû ew li ser wê rêbaza pîroz a Barzanî meşiya û dimeşe.

Ew rêbaz bû ku Kurd li Başûrê Kurdistanê di sala 1992'an kir xwedî otonomî . Dû re ew kir Federalî û niha jî gav bi gav berbi serxwebûnê ve diherin.

Her miletek qerzdarê hin rêber û serokên xwe ne. Loma Kurdên me yên her çar parçeyan jî niha qerzdarê Barzaniyê nemir e ku wî bi gulleya îlona 1958 him bêdengiya Kurdan şikand, him jî ew bû sedem ku îro em kurd li Başûrê Kurdistanê xwedî welatê xwe yê azad û di demeke nêz de jî em ê bibin xwedî dewleta xwe ya serbixwe.

Gelo dewleta serbixwe wê çi bide me Kurdan?

Kurdistaneke serbixwe; wê ruhiyeta Kurdî di mejiyê Kurdan û Kurdistaniyan de ji nû de bi cih bike da ku Kurd xwedî li welatê xwe derkevin.

Kurdistaneke serbixwe; wê wî mejiyê Kurdan ku hema hema tu nemaye ji Kurdbûnê dûr û ji Kurdistanê birevin li wan vegerîne.

Wê ev Kurdistana serbixwe ji nû de hin Kurdan bike Kurd da ku welatê xwe biparêzin berjwendiya welatê xwe di ser her tiştekî re bigirin.

Kurdistaneke serbixwe wê Kurdan bide nasîn, kî dost û kî dijmin e. Wê bide zanîn ku di welatê xwe yê azad de jiyandin çi ye, wê çi tamê û hêjayiyê bide.

Kurdistaneke serbixwe wê Kurdên ku di qada navneteweyî de mirîne, zindî bike.

Wê êdî li seranserê cîhanê Kurd bêne nasîn û zanîn ku ew kî ne, neviyên kê ne.

Kurdistaneke serbixwe wê Kurdan fêrî berjewendiya gelemperî bike da ku ji ya şexsî dûr bikevin û ya neteweyî biparêzin.

Bi rastî jî diyarkirina roja refarandûmê di meha îlonê de girîng e. Ji ber di vê mehê de, ji bêdengiyê û tirsê xilas bûn.

Ji ber Kurd di şoreşa îlonê de ji nû de şiyar bûn, di şoreşa gulanê de berxwedan û mafgirtin bû para wan û di refarandûma 21 îlona 2017an de Kurd dê bibin serbixwe û dewleta xwe ya Kurdî ragihîne ala xwe ya rengîn di nava alên cihanê de bilind bike..

Her weha ev refarandûm û berdewamiya wê Kurdistana serbixwe wê Kurdên dîasporayê ji bindestiyê û ji bêxwedîtiyê jî xilas bike. Kurdên dîsaporayê êdî wê bizanibin ku ne bêxwedî ne, di her warî de wê dewleta wan êdî xwedîtiyê li wan bike. Yanî em ê weke Kurdên dîaporayê ji sêwîtiyê xilas bibin.

Bila refarandûma ji bona serxwebûna Kurdistanê li gelê kurd pîroz be.

Karîkator ---------- Dijwar Ibrahim

ÎSMAÎL GUVEN

Gedeyî û Dadî-Babî (2)
Hewayê Ewnîyayîşê Dadî û Babîyan

Hîrê hewteyan ra dima reyna merheba wendoxê delalî. Mi beşa verêne de hewl da ke çar dewranê verênan yê xurtbîyayîşî yê teorîya Erik Eriksonî binusa û taybetîyanê gedeyan bida bi şima naskerdene. Na beşe de zî ez wazena Hewayê Ewnîyayîşê Dadî û Babîyan ser o binusa û dadî û babîyan bida bi şima naskerdene. Şima do nê nuşteyî de virazîyayîşê kesayetîye ser o tesîrê faktoranê keyeyî bivînî. Labelê verî ke ez dest pê bika ez wazena derheqê virazîyayîşê kesayetîye de îzehetêko qijkek bika. Kesayetîye tena binê tesîrê faktoranê dormaleyî de şekil nêgena; qasê faktoranê dormaleyî, faktorê genetîkî zî tesîrker ê. Coka çîyo ke cêr de nusîyayo nîno na mana ke seba her kesî se ra se wina yo.

1) Dadî-Babîyê Pawitoxî:
Nê keyeyan de bi zafanî ya tena gedeyêk esto ya zî mudeyêko derg ra dima gedeyêk beşdarê keyeyî bîyo. Tîya de dadî, goreyê babî gedeyê xo de hîna zaf eleqedar a. Yanî midaxaleyê her kerdena gedeyî kena, hereketanê ey serarast kena, her problemê gedeyî de hetkarîya ey kena. Nêverdena gede problemanê xo reyde rîbirî bimano û înan çareser bikero. Her dadî û babî vrerba îhtîmalê zerarvînayîşê gedeyanê xo tersenî û endîşe kenî; labelê nê dadî û babîyan de ters û endîşeyêka hedravîyartîye esta. Goreyê nînan îhtîmalê zerarvînayîşê gedeyî hema vaje se ra se yo û ganî gedeyê xo nê zeraran ra bipawî. Peyina nê kerdenanê nînan de gedeyêko pabeste û pasîf vejîyeno werte; çirey însîyatîf nêgeno, probleman ra terseno-remeno, her wext wazeno wa verê xo de yew desteg bibo.

2) Dadî-Babîyê Redkerî:
Nê dadî û babî gedeyanê xo her tim rexne kenî, serkewtişanê înan qebul nêkenî, hetê hîsî ra înan îstîsmar kenî. Îhtîyac û problemanê gedeyanê xo nêvînenî, eke bivînî zî seba çareserîye çîyêk nêkenî. Nê kerdenê dadî-babîyan benê sebeb ke ameyox de gedeyêko agresîf, bêserûber, meylê sucî û endîşeyin bivirazîyo.

3) Dadî-Babîyê Neeleqedarî:
Tîya de estbîyayîş ya zî çinbîyayîşê gedeyî dîyar nîyo. Heta ke gede kerdenêka ecizkere nêkero, dadî û babî ra nêaseno. Labelê wexto kerdena gedeyî seba dadî û babî nerehetîye viraşt, o wext keye de estbîyayîşê gedeyî dîyar beno. La no dîyarbîyayîş pozîtîf ney, negatîf o. Nê keyeyan de mabênê dadî, babî û gedeyî de têkilîye çin a, ya zî zaf tay a. Nê gedeyî wexto benê pîl ronayîşê têkilîyanê mîyankesî de çetinîye ancenî, bawerîya xo bi xo zeîf a û her tim wazenî wa kesê bînî bala xo bidê înan ser.

4) Dadî-Babîyê Otorîterî
Nê dadî û babî, midaxaleyê her kerdena gedeyî kenî, qerarê gedeyanê xo qebul nêkenî, waşteyanê înan pêgoş kenî, yewê xo ra nînê war. Herinda gedeyanê xo de qerar genî û çirey fikrê înan nêgenî, eke heqê qisekerdişî bidê înan zî tena goşdarî kenî, yanî amancê înan fehmkerdiş nîyo. Her xetaya gedeyan de înan rexne kenî. Dadî-babîyanê pawitoxan de zî midaxele û rexne esto; labelê înan de tersê zerarvînayîşê gedeyê xo esto û amancê înan pawitişê gedeyê xo yo. La yê otorîterî, xora nameyî ra dîyar o, derdê înan kontrolkerdişê gedeyî yo. Mantixê nê dadî û babîyan wina yo: Gede nêeşkeno qerarêko rast bido, peyco poşman beno; holîya gureyî ma seba gedeyê xo qeraro tewr baş bide. Goreyê cigêrayîşan gedeyê nê dadî û babîyan, di sereyanê zitan de ca genî: ya her çî ra vanê "eya" û mil nanê ro, ya zî benê îsyankarî û verba her çî îtîraz kenî.

5) Dadî-Babîyê Mikemelîwazî:
Her çî ra ver nê dadî-babî bi xo mikemelîwaz (ing. perfectionist) î. Coka goreyê înan ganî gedeyê xo zî mikemel bî. Nêbeno ke çîyêk şaş, kêm ya zî nîmcet bivirazî. Ganî her çî bê xeta, bi hewayêko tewr baş bivirazî. Ganî yew ware de zî hevalanê xo ra tepîya nêmanî, her wext vernîya her kesî de bî. Çirey beno sinife de yê dîyin bî, qey çîyê yê yewinî gedeyanê xo ra zaf o ke... Nê dadî-babî her tim midaxaleyê gedeyanê xo kenî; "to weş kerd, la werîşna to wina bikerdîn." Yanî memnun nêbenî, her çî de yew xeta yew kêmanî vînenî. Pê kerdena xo û gedeyanê xo kêfweş nêbenî. Amancê înan cakerdiş û çinekerdişê kêmasîyan o. Û peynî de gedeyêko sey înan mikemelîwaz virazîyeno.

6) Dadî-Babîyê Bêhemsencî û Bêqerarî:
Panc grûbanê verênan de, her çend kerdenanê îstîsnaîyan nîşan bidî zî ma zaf ra tay dadî-babîyê bihemsencî û biqerar dîyê. Kerdenê xo şaş bî zî gedeyan verba derbanê dadî û babîyan, xo rê tirsêk (mertal) viraştbi û xo derban ra pawitêne. Yanî wayîrê mekanîzmayanê xopawitişî (ing. defense mechanisms) bîy. La gedeyê na grûbe, nê tirsî ra mehrum ê. Çimkî nê dadî-babî verba eynî hereketê gedeyanê xo refleksanê cîya-cîyayan nîşan danê. Gedeyê ke nê keyeyan de benê pîl, nêeşkenê refleksanê dadî û babîyê xo texmîn bikerî û coka nêzanê se bikerî.

Netîceya musabeqaya xelata kovara Vateyî bellî bîye

MUSABEQAYA Xelata Kovara Vateyî ya Warê Hîkaye û Şîîra Kirmanckî (Zazakî) ke seba pîrozkerdişê hûmara 50. ya kovara Vateyî û berzkerdişê qedr û qîymetê nuştişê kirmanckî, hetê Grûba Xebate ya Vateyî ra ameybî organîze kerdene, netîceya aye bellî bîye.

Goreyê naye xelate warê şîîre de layiqê şîîra "Birînê Tegelinî" ya Ugur Kirmancî, warê hîkaye de zî layiqê hîkayeya "Şadîya Şade" ya Qemer Erdoganî ameye dîyayene. Semedê îlankerdiş û dayena xelate ra 09. 04. 2017, saete 14: 00 de şubeyê Dîyarbekirî yê Weqfa Îsmaîl Beşîkçî de yew merasîm virazîya.

Şexsîyetanê sey Mehemed Malmîsanij, J. Îhsan Espar, Mehmud Nêşite, Nadîre Guntaş Aldatmaz, Nurettîn Celalî, Denîz Gunduz, Seîd Veroj, Ahmet Kasimogluyî ra teber tayê wendoxê beşê kurdolojî yê Unîversîteya Artukluyî ya Merdînî, sîneyoxê kirmanckî û mêmanê bînî beşdarê merasîmî bîyî.

Qiseykerdişê destpêkî yê merasîmî hetê nuştox û şaîr J. Îhsan Esparî ke eynî wext de endamê Grûba Xebate ya Vateyî yo û redaksîyonê Kovara Vateyî de ca gêno ra ame kerdene. Esparî, verê cû bi nameyê redaksîyonê kovara Vateyî, seba kede û renca înan endamanê jurîyê şîîre, mamosta Mehemed Malmîsanij û Newzad Valêrî rê û yê hîkaye Pinar Yildize, Munzur Çem û Deniz Gunduzî rê sipas kerd. Dima ra ard vîrê mêmanan ke goreyê texmînan ewro dinya de 5000 ra heta 8000 ziwanî estê û nînan ra ê ke ziwanê resmî yê dewletan ê wayîrê heme îmkanan ê.

Esparî, qiseykerdişê xo wina domna " Labelê dinya de tayê ziwananê bêtalihan ser o sey varanê wisarî timûtim xezebe varena. Ziwanê ma dinya de ziwananê bêtalihan ra yew o. Talihê ziwanê ma çin o, bextê ziwanê ma sîya yo, qederê ziwanê ma xelet nusîyayo, çunke zilmo ke nê ziwanî dîyo, xedro ke bi nê ziwanî bîyo, dej û tadaya ke qiseykerdoxanî nê ziwanî vînaya dinya de çi kesanê bînan nêdîya. Merdim gama ke na rewşe ser o fikirîyêno, merdim mat maneno, na gosirmeta ke ameya ma û ziwanê ma ser, na polîtîkaya bêwijdane û bêrehme hende serrî senî dewam kerdo, çirê dewam kerdo, çi kes nêşîno bi aqil û bi mentiq îzeh bikero."

Qiseykerdişê Esparî ra tepîya xelata ey, hetê nuştoxe Nadîre Guntaş Aldatmaze ra dîyaye Ugur Sermîyanî. Badê teqdîmbîyayîşê xelate Sermîyanî xîtabê mêmanan kerd û wina va "Verê, seba ke ez layiqê na xelate dîya, ez endamanê jurîyî rê zaf sipas kena. Ez ziwanê xo, kirmanckîya şîrine, pîrika xo Êta Usivî ra musaya. Coka, ez na xelate îthafê aye kena."

Sermîyanî, dima behsê muhîmîya ziwanî kerd û qiseykerdişê xo wina domna "Ziwan ruhê yew şarî yo û şaro ke ziwanê xo ra kewt dûrî, ruhê xo kî vîndî keno. Seba ke ma ruhê pîrbabanê xo vîndî mekerîme, ma ganî bala xo bidîme ziwanê xo ser, xebatanê xo ziwanê xo de bikerîme. Ez hêvî kena ke organîzasyonê nîyanênî ziwanê ma de bi seyan, bi hezaran bêrê organîzekerdene. Çike no, teşwîq o, qedr û qiymet dayîş o, averberdiş o."

Ugur Sermîyanî, dima ra Mehemed Malmîsanijî ra rica kerd ke şîîra ey biwano û seba naye o dawetê kursî kerd. Gama ke mamosta Malmîsanijî şîîra Sermîyanî wendêne heme mêmanan deqayê hisînî vîyarnayî.

Dima ra Qemer Erdoxanî zî xelata xo destê nuştox û endamê Grûba Xebate ya Vateyî, Nurettîn Celalî ra girewte. Erdoganî, qiseykerdişê xo yê qilmî de şabîyayîşê xo îfade kerd û wina va: "Rasta jî xelat a ke zaf-zaf muhîm a seba mi. Ez her çîyî ra ver naye vajî. Heto bîn ra serrgêra vîstine ya kovara Vateyî ya. Ez wazena na xelata xo îthafê xebatkaranê kovara Vateyî bikerî û zaf sipas kena" Merasîm bi îkrambîyayîşê çîyanê werdiş û şimitişan qedîya.

Seke yeno zanayîş Vate, tarîxê nuştişê lehçeya kirmanckî de kovara yewin a ke safî bi kirmanckî neşr bîya û rojanê peyênan de hûmara pancas û yewine ya aye vejîyaye. Kovare eynî wext de çend kovarê kurdkî ke weşanê înan demêko derg û bi hawayo biîstîqrar domîyenê, înan ra yew a. Bi no wesîle kirmancan/zazayan reya verêne xoser yew musebaqaya edebîyatî viraşte û Xelata Kovara Vateyî bîye xelata yewine ya kurdkîya kirmanckî. Naye ra ma zî sey beşê kirmanckî yê Rojnameyê BASî amadekaran û xelatgirotoxanê na musabeqa pîroz kenê.

Hûmara 51. Ya Kovara Vateyî Vejîyaye

Hûmara 51. ya kovara kulturî ya Vateyî, sey hûmara zimistanî ya emserî vejîyaye. Hûmara zimistanê 2017î, 247 rîpelî ya û qapaxê aye bi xebatêka Kurt Jacksonî ameyo dîzayn kerdene.

Sey her hûmare, destpêkê na hûmare de zî nuşteyê redaksîyonî ke hertim bi sernuşteyê "Wendoxan rê" neşr beno ca girewto. Bêguman temamê nê nuşteyî erjaye yo la seba ke ma rê zaf manîdar ame, ma ci ra yew cumle neqil kenê; "... Ma bawer kenî ke rew yan erey ziwanê ma beno ziwanê perwerdeyî, coka xebatê ke ma ewro kenî hem seba ewro yê la hem zî seba siba yê" Fotoğrafo ke qapaxê peyên ya kovare de çap bîyo yê Malîk Kayayî yo.

Sernuşteyê nuşteyan û nameyê nuştoxanê na hûmare nê yê:

Şîîranê Kirmanckî (Zazakî) de Babete û Qafîye - Mîhrîban KANATE
Nika şîîra mi Sûre & Mi serd o - J. Îhsan ESPAR
Almancî - Nadîre Guntaş ALDATMAZ
Feko Zureker Huyayîşo Lal - Akman GEDÎK
Mîlçika Sûre - Munzur ÇEM
Hîrê Şaîrê Xozatijî - Ugur SERMÎYAN
Xem Zereyê Xemî De - Sohrab SEPEHRÎ
Ehmedê Xasî û Mewlîdê Nêbî - III - Mehmed Selîm UZUN
Eşqê Gedetî yê Bextewarî rê Yew Xazel - Pinar YILDIZ
Gaxand de - Huseyîn KARAKAŞ
Deyîranê Kirmanckîyanê Anonîman de Motîfê Heywanan - Mesut YEŞÎLKAYA
Şeyda Asmîn Reyde Roportaj - Rop. Alî Aydin ÇÎÇEK
Rîpelê Fiqra û Meseleyan: Îmamê Dewa Elewîyan
& Merdimo Xirîstîyan û Qurban - B. ŞÎLAN

Ancîya seke her hûmare de êno vînayene, rîpelê na hûmare zî bi resman û fotografanê weşan ameyê xemilnayîş û peynîya aye de beşê Rîpelê Kitaban o ke tede kitabê kirmanckî yê neweyî dîyenê şinasnayîş ca girewto.

Panoromaya rojnamegerîya kurdkî ra kirmanckî

MUTLU CAN

NAYE ra 119 serrî verê cû, 22 nîsane 1898 de Rojnameyê Kurdistanî dest bi weşanê xo kerd. Keyeyê Bedirxanîyan ra M. Mîdhet Bedirxanî, hûmara yewine ya Kurdistanî paytextê Misirî Qahîre de vete. Pêsero 31 hûmarê ey çap bîyê û hûmara 5. ra dima hetê Ebdurrehman Bedirxanî ra weşanîyayo. Kurdîstan rojnameyo kurdkî yo tewr verên o ke hetê kurdan ra ameyo çap kerdene. Naye ra her serre 22 nîsane sey roja rojnamegerîya kurdî yena pîrozkerdiş. Yewna xususîyetê nê rojnameyî no yo ke tarîxê çapemenîya kurdan bi weşanîyayîşê ey dest pêkeno. Ma bi na munasebete serê de M. Mîdhet û Abdurrehman Bedirxan birayan heme rojnameger û nuştoxanê kurdan ê rehmetîyan ke keda înan çapemenîya kurdan ser o esta bi hurmet û rehmet yad kenîme.

"Begefendî"*

Ez îftîxar kena ke hûmara tewr verêne ya Rojnameyê Kurdistanî ke mi Qahîre de newe çap kerda to rê erşawena.

Miletê mi; miletê Kurdî, Asyaya Qije de ciwîyeno û milet o ke pêro-pîya şeş mîlyonî ra zêdeyêr nufusê xo esto û bi ziwanêkê kehen qisey keno.

Nê ziwanî de reya verêne rojname çap beno. Bi weşanayîşê ney amancê mi no yo ke miletê xo mîyan de heskerdişê perwerdeyî (zanayîşî) aver bêra, kurdan teşwîq bika ke rayîrê medenîyetê modernî de aver şorê û eynî wext de edebîyatê înananê neteweyî bi înan bida şinasnayîş.

Semedo ke pîyê mi Prens Bedirxanî, seba xoserîya Kurdistanî vera îdareyê Abdulmecîtî şer kerd, padîşahî welate ma de îqametkerdişê keyeyê mi qedexe kerd. Ez no semed ra ameya Misir û seba ke wazena Kurdistan de bandora nîzam û aştî bivîna waştişe mi no yo ke bi wasitayê nê rojnameyî dûrî ra semedê fayde, bextewerî û averşîyayîşê înanê entelektuelî merdimanê welatê xo xebate bikera"

(*M. Mîthed Bedirxanî, gama ke hûmara yewine ya rojnameyê Kurdistanî erşawita tayê kesan, yew kart a ke ser o bi franskî amancê xo nuşto, a zî erşawita.)

Baş o, ma seba ke bingeyê tarîxê rojnamegerîya kurdan teşkîl kerdo ma biney qalê Rojnameyê Kurdistanî kerd. Nika zî wazenîme ke rojnameyanê kurdkî de cayê lehçeya kurdkî çi bîyo? Nê perspektîfî ra biewnîme manzaraya rojnamegerîya kurdî ya se û newês serreyine ra.

Roja Newe

Hûmara yewine ya Roja Newe 15. 5. 1963 de Îstanbul de çap bena. Goreyê zanayîşê ma yê ewroyinî no rojname tena yew hûmare vejîyo. Rojname bi kurdkî û tirkî û sey 8 rîpelî weşanîyayo. Muhîmaya xo ya verêne no yo ke tarîx de rojnameyo tewr verên o ke tede nuşteyê kirmanckî neşr bîyê. Nê her di nuşteyî metnê folklorîk ê û rîpelê 4. de ca girewtê. O yewin bi nameyê Xona Heci yew deyîr a ke mintiqaya Çewlîgî ra arê dîyaya, o dîyin zî bi nameyê Macera i Silêmonî Gince yew mesel a. Ancîya rojname û weşano tewr verên o ke nameyê xo bi kirmanckî yo. Roja Newe tarîxê nuştişê kirmanckî yê modernî de nuqtaya destpêkê ya sembolîke teşkîl keno.

Roja Welat

Hûmara yewine ya Roja Welatî gulana 1977 de Anqara de çap bena. Rojname weşanê xo bi kurdî û tirkî kerdo û Tirkîya de ancax 12 hûmarê ey weşanîyayê. Hewt hûmarane rojnameyî de nuşteyê kirmanckî ca gênê. Zafaneyê nê nuşteyan tekstê folklorîk ê. Rojnameyo 2. o ke tede nuşteyê kirmanckî weşanîyayê. Yewna xusîyetê nê rojnameyî tede weşanîyayîşê sanika tewr verên a ke demo modern de

arê bîya. Nameyê na sanike Koramore yo û mintiqaya Dêrsimî ra arê dîyaya.

Armanc

Armanc, gulana 1979 de Swêd de dest bi weşanê xo keno. Hetanî hûmara 62. bi tirkî û kurdkî dima ra tena bi kurdkî çap beno. Weşanê xo hetanî serra 1997 û hûmara 179. domneno. Berpirsîyarê beşe kirmanckî Malmîsanij o. O zî mîyan de nêzdîyê 40 kesan tede nuştê. Zaftewirîya nuşteyan bala merdimî/e ancena. No rojname hetanî weşanayîyayîşê Kovara Vateyî (1996) ke tarîxê nuştişê kirmanckî de manaya çatrayîrî temsîl kena hîrê weşanê ke tede bi hawayo sistematîk û nîsbeto gird de ca dîyayo lehçeya kirmanckî, înan ra yew o. (ê bînî kovara Tîrêj û kovara Hêvî)

Rojname

No rojname 1991 de badê wedarîyayîşê qanûnê 2932 numreyin o ke warê weşangerî de kurdkî qedexe kerdêne Îstanbul de dest bi weşanê xo keno. Tirkîya de rojname û eynî wext de weşano kurdkî yo yewin o ke bi hawayo fermî ameyo çapkerdiş. Tena tek hûmara ey vejîya; a zî sey hûmara prova ya. Tede çar nuşteyê kirmanckî weşanîyayê. Nuştoxê înan M. Malmîsanij [yewê xo bi naznameyê Roşan Barîçekî) û M. Alî Eren ê.

Welat

Rojnameyê Welat, aşma sibete ya 1992 de dest bi weşanê xo keno. Eke ma Rojnameyî nêhesibnê eşkenê vajîme ke rojnameyo 1. o ke Tirkîya vejîyayo Welat o. Yewna taybetîya xo ya muhîmê bi hezaran hebî çapbîyayîşê ey o. Reya verêne Welat beno wayîrê îmkananê vilakerdişî û reseno bi hezaran wendoxan. Hûmara xo ya 1. ra tepîya bi hawayo sistematik ca dayo nuşteyanê kirmanckî. Tede zaf kesî nuştê.



M. Mîdhed Bedirxan

Azadi

Rojnameyê Azadi, 17 gulane 1992 de dest bi weşanê xo kerdo. Azadi, hewte de reyêk çap bîyo û bi kurdkî û tirkî vejîyayo. Herçiqas goreyê kurmanckî bi hawayo nîsbî bo zî ca dayo nuşteyanê kirmanckî. Nê nuşteyî hîna zaf rîpelê 6. yan zî 7. yê rojnameyî de ca girewtê. Pêro-pîya 104 hûmarê ey weşanîyayê. Hetê tewiranê nuşteyan ra zêdeyîya tekstanê folklorîkan bale ancena.

Welatê Me

Tarîxê weşanîyayîşê hûmara 1. ya Rojnameyê Welatê Me 20 teşrîna peyêne 1994 o. Sey dewamê Welatî ameyo weşanayene. Pêro-pîya 46 hûmarê ey çap bîyê. Hema-hema ke her hûmare de nuşteyê kirmanckî estê.

Dengê Azadi

Dengê Azadi, 20 gulane 1994 dest bi weşanê xo kerdo û dewamê Rojnameyê Azadi yo. Bi tirkî û kurdkî weşan kerdo. Pêser o 42 hûmarê ey çap bîyê. 12yê înan de nuşteyê kirmanckî weşanîyayê. Hema-hema temamê înan tekstê foklorîk ê.

Ronahi

Ebdurrehman Bedirxan

Hûmara yewine ya Ronahi, 21 adare 1995 de vejîyaya. Sey dewamê Dengê Azadi dest bi weşan kerdo. Bi tirkî û kurdkî neşr bîyo. Pêsero 72 hûmarê xo weşanîyayê û 25ê înan de nuşteyê kirmanckî ca girewtê. Tede tena sey sanike, mesela, vateyê verênan tekste folklorîkî ney sey hîkaye, şîîre, roportaj metnê bînî zî weşanîyayê.

Azadiya Welat

21 çele 1996 de sey dewamê mîrasê Welat û Welatê Ma dest bi weşanê xo kerdo. Herçiqas goreyê kurmanckî tay bo zî hema-hema her hûmara ey de nuşteyê kirmanckî weşanîyayê. Rojnameyo kurdkî yo ke tede tewr zaf kesan nuşto Azadîya Welat o. Bi kirmanckî kunciknuşteyî (köşe yazısı) bi hawayo sistematîk û tewr zaf nê rojnameyî de çap bîyê.

Hêvî

Rojnameyê Hêvî, teşrîna peyêne ya 1996 de dest bi weşanê xo kerdo. Dewamê Azadî, Dengê Azadi, Azadi yo. Sey ê bînan bi tirkî û kurdkî weşanîyayo la giranîya xo bi kurdkî ya. Pêsero 121 hûmarê ey çap bîyê û nînan ra 34 heban de ca dîyayê nuşteyanê kirmanckî.

Dema Nû

Hûmara yewine ya rojnameyê Dema Nûyî 15 adare 2001 de vejîyaya. Tirkîya de rojnameyê ke emrê înan tewr derg ramito, înan ra yew o. Ma nêeşkayî bizanê çend hûmarî çap bîyo la hûmara xo ya 316. esta. Bi hawayo nîsbî ca dîyayo kirmanckî. Munzur Çemî tede demêko derg nuşteyê goşeyî nuştê.

Peyama Kurd

17. 09. 2004 de Bonn de dest bi weşanê xo kerdo. Rojnameyêko hetweyane yo. Hema-hema her hûmara ey de nuşteyê kirmanckî neşr bîyê. Edîtorîya ey, Seyîdxan Kurijî kerdo û zaftewirîya nuşteyanê rojnameyî bale ancena. Pêsero 96 hûmarê ey neşr bîyê rojnameyê ke Ewropa de vejîyayê înan mîyan de çend hebê ke bi hawayo sîstematîk ca dayo kirmanckî, înan ra yew o.

Rûdaw

Hûmara xo ya yewine 2009 Köln de weşanîyaya. Rûdaw rojnameyê ke Ewropa de herçiqas bi nîsbeto şenik de bo zî rojnameyê ke tede nuşteyê kirmanckî bi hawayo sistematik weşanîyayê, înan ra yew o. Tede nêzdîyê 15 kesan nuşte nuşto. Ma reya verêne vînenê ke çend hebî nuşteyê Dr. Îsmaîl Beşîkçîyî çarnîyayê kirmanckî ser û nê weşanî de çap bîyê.

NewePel

NewePel, rojnameyo tewr verên o ke safî bi kirmanckî ameyo çapkerdiş. Hûmara ey a yewine 15 sibate 2011 de Dîyarbekir de weşanîyaya. Rojnameyo ke çarçewaya xebatanê ZIWA-KOMî (Komela Ziwan, Huner û Kulturî) dest bi weşanê xo kerdo û hema zî bi bê mabên vejîyêno, edîtorîya ci hetê Roşan Lezgîn û Bîlal Zîlanî ra yeno kerdene. Heta hûmara xo ya 50. pancês rojan ra rey na hûmare ra dima zî aşmêk de rey vejîyeno. Wexto nêzdî de humara 97. yê Newepelî vejîya. Ma vînenê ke tede 305 ra zedêyêr kesan nuşto û Kovara Vateyî ra dima weşano perîyodîko dîyin o ke tarîxê nuştişê kirmanckî de rolêko pîl kay kerdo.

Welat Verroj

Sey îlaweyê rojnameyê Azadîya Welatî vejîyayo. Tarîxê hûmara xo ya verêne 11. 02. 2011 o. Ma nêeşkay tesbît bikê ke çend hûmarê ey vejîyayê la ma xeyrcê çar hûmaran hetanî hûmara 61. pêro hûmarê ey dîyî. Sey îlaweyêk zî bibo warê rojnameyî de weşano 3. o ke safî bi kirmanckî neşr bîyo û tedê nuşteyê 57 kesan weşanîyayê.

Rojnameyê Zazakî

Hûmara ey a yewine teşrîna verêne ya 2013 de vejîyaya. Eke ma bîyarîn xo vîr ke Welat Verroj xoser rojnameyêk nîyo, no rojname rojnameyo 2. o ke safî bi kirmanckî neşr bîyo. Aye ra teber krmanckî de rojnameyo mehellî yo verên o û 12 hûmarê ey vejîyayê. Qaso ke edîtorê ey melumat da ma no rojname do demêko nêzdî de weşanê xo înternetî ser ra bidomno.

BasNûçe

Gulana 2014 de dest bi weşanê xo kerdo. Pêro-pîya 125 hûmarê nê rojnameyî vejîyayê. Tede gelek nuşteyê kirmanckî weşanîyayê. Zafî û zaftewirîya nuşteyan bale ancenê. Çîyo balkêş ma dî ke tayê înan verê cû rojnameyê Newepelî de weşanîyayê. Xulasa çend rojnameyê ke serranê 2000î ra pey vejîyayê û tede bi hawayo sistematîk ca dîyayo nuşteyanê kirmanckî, înan ra yew o.

Rojnameyê bînî ke tede nuşteyê kirmanckî weşanîyayê nê yê: Ronahi (Almanya, 1971), Kurdistan Press (İsveç, 1986), Jîyana Nû (İstanbul, 1994), Özgür Politika (1995, Almanya), Roj (İstanbul, 1995), Nû Roj (İstanbul, 1996), Roja Teze (İstanbul, 1998) Yeni Özgür Politika (Almanya, 2006), Politikart (Gazete eki, Almanya 2008), Bajarname (Diyarbakır, 2014), Bas (İstanbul, 2016), Rojeva Medya (İstanbul, 2016)

Herinda Peynî de

Ma vînenê ke demê peyên yê Osmanîyan ne tede rojnameyê kurdkî/kurdan ê ke hetanî nika vejîyayê, hema-hema pêrune înan de muhîmîye dîyaya lehçeya kirmanckî û tede nuşteyê kirmanckî ameyê weşanayîş. No zî çîyêko normal o çunke qasê kurmanckî, sorankî ûeb. kirmanckî zî parçeyêkê kurdkî yo. Helbet merdim nêeşkenê vajo ke goreyê nufusê ma mîqdarê înan zaf o. Tabî ma tîya nêeşkenê sedemanê înan akerê la naye de rolê dezavantajanê ma kurdê kirmancan zî esto. Manaya peroyî de rojnamegerîya kurdkî goreyê vizêrî nuqteyêka hîna avere de ya û bêguman a do averşîyayîşê xo bi îmkananê modernan û xeta hêvî û talebanê miletê xo de bidomna. Mabi persêk biqednê; heqet şima vajê nameyê rojnameyanê ma teasufen panîyayê? Biewnîn; Roja Newe, Roja Welat, Armanc, Welat, Azadi, Dengê Azadî, Ronahi, Hêvî, Azadîya Welat …

Tehmên ji çiyayên Agiriyê:

Gûlîk, ribês, kereng û mendik...

GÖNÜL GÜN

Li Agiriyê gelek fêkî û sewzeyên çiyayî hene ku qîmeta wan a aborî jî heye. Di nav wan de gûlîk, ribês, mendik û kereng sereke ne. Firoşkarên Agiriyî van him di bazara Agiriyê de difiroşin, him jî dişînin derveyê bajêr. A niha jî ji bo firoşkarên Agiriyî amadehiya biharê bi gûlîkê ve dest pê kir.

GELÊ Agiriyê debara xwe zêdetir bi çandînî û heywankariyê dike. Tevî vê sewze, fêkî û firoşkariya pincaran jî dikin. Bi bihara ku deşt û çiyayan rengîntir dike re sewze, fêkî û gihayên çiyayî li dezgehan hate danîn. Bi taybetî nebatên ku li deverên bilind û çiyayan şîn dibin van rojan liv û tevgera dezgehan zêdetir kir.

Nivîskar û lêkolîner Nihat Öner dibêje gelek nebat û pincarên ku li Agiriyê digihêjin û têne berhevkirin, di nav bazara bajêr û derveyê bajêr de tên firotin.

Öner balê dikişîne ku gelheya (populasyona) ajal û nebatan a li çiyayên Ararat (di nav gel de Gilîdax jî tê gotin) û Sîpan bi taybet ya Kosedaxê pir dewlemend e. Öner dibêje a niha li Agiriyê firotina gûlîkê jî dest pê kiriye. Her wiha Öner got ger hewa baş be gûlîk di nava Adarê de ger ne baş be di destpêka Nîsanê de şîn dibin û di nav 15 û 20 rojan de jî tên berhevkirin. Ger di vê wextê de neyê berhevkirin kartî dibe û nayê xwarin. Öner wiha behsa pêvajoya firotina gûlîkê dike: "Di dema gûlîkê de firoşkar berhev dikin û vê sewzeyê di depoyan de diparêzin. Gûlîkên veşartî di nav du an jî sê mehan de tên firotin. Gundî û firoşkarên Agiriyî him di bazara Agiriyê de difiroşin, him jî ji firoşkarên li metropolên Tirkiyeyê re dişînin. Kurdên li Stenbol û Îzmîrê dijîn gelek gûlîk dikirin."

"Niha 3 kîloyê gûlîkê bi 10 lîreyî tê firotin"

Öner dibêje her bihar gelê Agiriyê ji xizmên xwe yên derveyê bajêr re gelek nebat, fêkî û sewzeyên çiyayî dişînin, Öner got gûlîkê herî baş û zêde li navçeya Xamûrê li gundê Evdê, li derdora çiyayê Sêgira û Newala Zerê digihêje. Her wiha di navbera gundên li derdora çemê Muradê û navçeya Dutaxê jî ew digihêje.

Her wiha Nihat Öner wiha pê de diçe; "Li Agiriyê a niha 3 kîloyê gûlîkê bi 10 lîreyî tê firotin. Lê ger hewa hinek baş bibe dê ew zêdetir bibe. Dibe ku kîloyê wî heta lîreyek jî bikeve. Gelê Agiriyê bi gûlîkê ve gelek xwarin çêdikin; Savarê Gûlîkê, Şorbeşîr û Kadê Gûlîkê jî yek ji wan in. Her wiha ev sewze ji bo roviyan gelek baş e di çakbûna qebzê de jî derman e."

"Di biharê de bi sedan kîlo ribês bo derveyê bajêr tên firotin"

Pincarek din jî ribês e. Ribês di heman demê de wek "Mûzê Kurdistanê" jî tê zanîn. Öner dibêje ribês ligel gelek deverên Agiriyê li navçeya Zêtka, derdora Kosedax û gundên li quntarên vî çiyê şîn dibe. Öner diyar dike ribêsa herî rind ya li derdora çiyayê Kosadaxê ye! Û ribês di dawiya meha Nîsanê de şîn dibe û heta 2 mehan tê berhevkirin. Öner da zanîn gelê Agiriyê gelek ji ribêsê hez dike.

"Ribês wek deste tê firotin. Pênc-şeş ribês bi hev ve tên girêdan û dibe desteyek. Desteyek ribês kêm zêde bi 4 an jî 5 lîreyan tê firotin. Ribês jî wek gûlîk di bazarên Agiriyê de cihekî girîng digire. Gelê Agiriyî di biharê de bi sedan kîlo ribês difiroşin derveyê bajêr. Tirk û Kurdên ku li Tirkiyeyê dijîn eleqeyeke mezin nîşanî ribês didin. Gelê Agiriyî hin caran êdî nikarin ribês bibînin û bikirin. Ribês wekî mûzan e, tê spîkirin û bi xwê an jî bêxwê tê xwarin."

Öner bal dikişîne ku ev çend salên dawî li ser ribês wekî ku ribês dijminê pençeşêrê ye nîvîs û nûçe tên nivîsîn dibêje û wisa pê de diçe: "Ne tenê ribês, koka wî jî tê xwarin. Dibêjin ku kokên ribêsê ji bo diyabetê baş e. Ji bo vê yekê gel bi xwe diçe berhev dike an jî ji baharatfiroşên Agiriyê koka ribês dikirin."

"Li Agiriyê du cûre kereng tên xwarin"

Halime Önera ku li Agiriyê dijî derbarê gelek sewze, fêkî û gihayî de agahdar e. Ew jî dîsa behsa pincarekî din a Agiriyê dike. Kereng li her derê Agiriyê şîn dibe. Li Agiriyê du cûre kereng digihêjin, yek Kereng yê din jî Kerengzer e. Rengê zer yê kerengzerê dibe ku spî an jî zer bibe. Öner dibêje "kereng jî wekî giha û sewzeyên din di bazarên Agiriyê de gelek tên firotin. Her wiha Agiriyî ji bo xizmên xwe yên li derveyê bajêr dijîn wekî sewze û gihayên din her bihar kereng jî dişînin."

"Mendik di çêkirina penêr û toraqê de tê bikaranîn"

Melik Özmüşê Agiriyî jî her bihar pincarên çiyayî berhev dike, niha ew jî behsa gihayê mendik dike. Özmüş dibêje; "Li Agiriyê mendik herî zêde li gundên Dutaxa ku li herêma Eledaxê ye digihêje, di dawiya Nîsanê de şîn dibe û di nav 2-3 mehan de jî tê berhevkirin." Özmüş diyar kir ku mendik him di bazara Agiriyê de, him jî di derveyê bajêr de tê firotin. Ew giha bi piranî di çêkirina penêr û toraqê de tê bikaranîn. Her wiha xwarin, şorbe û tirşiya mendik jî tê çêkirin. Li aliyê din di nav şorbeyan de wek baharat jî tê bikaranîn.

Li agiriyê heman demê kuvark/karî, givîj, sinc, şîlan, hêliz, cax/çixşur, gezgezk, tolik, pûng, belhewêz, siping, pariyê/nanê çivikê û hwd. sewze, fêkî û pincar şîn dibin.

Jin berhev dikin, mêr difiroşin

Jinên gundan yên ku li çiyayên Bakurê Kurdistanê kerengan berhev dikin him nebatan ji bo xwarina xwe bi kar tînin him jî difiroşin û pê debara xwe dikin. Di destpêkê de deverên ku li Bakurê Kurdistanê lê şîn dibin Qerejdax û quntarên wê ne. Gundiyên li quntarên Qerejdaxê her roj kerengan berhev dikin. Kereng ji aliyê jinan ve tên berhevkirin, ji aliyê mêran ve jî tên firotin. Kîloyê kerengên li bazaran bi 6 û 10 lîreyî tê firotin. Kereng ji bo tenduristiyê jî gelek baş e. Bi taybetî ji bo kisîka safrayê, teqîna perdeya guh baş e. Her wiha benişte wî jî ji bo diran û pidûyên diran gelek kêrhatî ye.

Kulîlka pîroz a du dînan:

Hilberînerên guldexwînan li benda piştgiriyê ne

CESİM İLHAN

GULDEXWÎNA ku binyatê wê Bakurê Kurdistan e, yek ji cûreyên kêmditî ye. Niha ew li ber gefa hewlên nelegal a bazirganên biyolojîk e, ji bo ku guldexwîn di bazara xwemalî de were firotin hilberîner li benda alîkariyê ne. Li Bakurê Kurdistanê guldexwîn wek "Zengila Zoma" jî tê zanîn û bi hatina meha Nîsanê re kulîlkên rengîn vedikin. Lê ji ber ku nikare bazarekê bibîne di destê hilberîneran de maye. Ji bo guldexwînên ku li Sêwereg û Qerejdaxa Rihayê digihêjin hilberîner ji şaredariyan û wezareta xurek û çandiniyê piştgiriyê hêvî dikin.

Serokê Yekîtiya Hilberînerên Kulîlk a Siruştî ya Sêweregê Sedat Kiran diyar dike guldexwîn dibe li peyzajên bajêr were bikaranîn û bi vî awayî karekî bazar û istîhdamê peyda bibe. Kiran dibêje "Guldexwînan bi riyên qeçax dişînin derveyê welêt. Ger pêşiya vê bazirganiyê neyê girtin dê guldexwîn rastî tûnebûnê werin."

167 cûreyên guldexwînan hene û tevî ku navenda genetîka wan Bakurê Kurdistanê ye jî bi riyên nelegal ji welatên Ewropayê re tên firotin. Guldexwîn di endûstriya derman û kozmetîkê de tê bikaranîn, ligel vê yekê wek nebateke xemlê jî tê zanîn.

Gelo hilberîner li benda çi piştgiriyê ne?

Kiran dide zanîn cûreyên laleyên li herêmê yek ji dewlemendiyên herêmê ne û ew dikarin riya pîşeyan jî vekin. Kiran wiha pê de diçe; "Hollandayê heta deh salan lale werdigirtin. Lêbelê du salên dawî ne êdî qut kiriye û nagire. Ew jî hilberîneran dixe tengasiyê. Hilberîner nikarin bazareke din bibînin, ji ber ku bazar nîne di bazara Tirkiyeyê de bar dikeve ser milê şaredariyan, di serî de jî Stenbol. Divê şaredariyên wek Riha, Amed jî ji bo piştgiriyê dest bi kirîna laleyan bikin."

Hilberînerên 'zengila zoma' an jî guldexwînê her ku diçe kêmtir dibe. Hilberînên heyî jî ji ber sedema ku nikarin bazareke firotinê bibînin û bê piştgirî ne, dibêjin dê ew dev ji hilberîna guldexwînê berdin.

"Em nikarin berhemên xwe bifiroşin"

Yek ji hilberînerên guldexwînan Mukail Bilen wiha dibêje "Bila piştgiriyê bidin me, em êdî nikarin berhemên xwe bifiroşin. Em wek hilberîner mexdûr dibin. Şaredarî li şûna ku berhemên xwe ji yek cihê bistînin, bila hinek ji me jî bikirin. Em ji bo ku nebatên herêma Qerejdaxê tune nebin hewl didin. Daxwazeke me tenê heye ew jî bila rayedar di vê mijarê de alîkariya me bikin."

Guldexwîn herî zêde li Kurdistanê şîn dibe

167 cûreyên guldexwînan hene û tevî ku navenda genetîka wê Bakurê Kurdistanê ye jî bi riyên nelegal ji welatên Ewropayê re tên firotin. Guldexwîn di endûstriya derman û kozmetîkê de tê bikaranîn, ligel vê yekê wek nebateke xemlê jî tê zanîn. Di cîhanê de tu mînakeke wê ya din nîne, kulîlka wê sernivîşî radiweste û rêçal jê diherike. Guldexwîn tenê hin deverên Riha, Colemêrg, Wan, Bêdlîs, Erzirom û Batmanê bi awayekî xwezayî şîn dibe. Li Kurdistanê 43 cûreyên wê hene, ji wan 20 heb cûreyên kêmditî ne. Bejna wê ji 30'yî heta 100 santîmîtroyî diçe. Rengê wan jî wek sor, narincî û zer diguhere. Her wiha guldexwîn zêdetir li herêma Şemzînan û Colemêrgê şîn dibe, ber hindê di nav gel de jê re wek laleya Şemzînanê an jî laleya Colemêrgê jî tê gotin.

Bruno Vieira Amaral:

“Eger yek jiyana me dinivîse, ew kes ne romannivîsek e.”

CIWANMERD KULEK



Fotografia: Denise Rolo



BRUNO Vieira Amaral, bi romana xwe ya yekem (As Primeiras Coisas) dengekî mezin li Portekizê veda û gelek xelat wergirtin. Hîn ew roman hino hino bo zimanên dî dihat wergerandin, romana wî ya duyem (hoje, estarás comigo no paraiso) çend roj berê derket. Berî derketina vê romanê bi çend rojan me li Rojhilata Dûr hevdu dît. Hêja ye mirov fikrên balkêş ên vî nivîskarê zîrek guhdarî bike. Fermon...

***Te kitêbek li ser qerekterên fîksîyonê nivîsî, bi navê *50 Qerekterên Fîksîyona Portekizî*. Ji nav wan yekî ku tu xwe tê de dibînî yan nêzîkî xwe dibînî heye?**

Yek heye. Qerekterekî romana –li gor min – herî girîng a edebiyata Portekîzî ye. Ev kitêb romaneke sedsala nozdehemîn e. Navê wê *Os Maias* e. Çîroka malbatekê ye. Qerekterê wê yê sereke û hevalên wî, temenê wan derdora bîst salî ye, destbirakîyeke xurt di navbera wan de heye. Evî lehengê me yekî agirê sor e, ateîst e û hwd. Di wî temenî de nimûneya her tiştî ye ku tu di wî temenî de dixwazî bibî. Di heman demê de yekî romantîk e, hestiyar e, misêwa dilê wî dikeve hinan. Bi pereyê dê û bavê xwe dijî, lewma azad e, şeyda ye, dîwane ye. Lê di heman demê de mirovekî nazik e, jar e; pîlana wî ew e ku wê kitêba qerase binivîse ku navê wê Bîranînên Atomekê ye. Dibêje ku ev kitêb bîranînên atomekê ên li ser rûyê erdê ên ji destpêka demê heta îro vedigêrre (qal dike). Helbet, ti carî nikare vê projeya mezin a şêtane û megalomanyak biqedîne, hetta hîç dest bi nivîsîna wê nake. Gelek tişt tê de hene ku mirov weke tiştên ji xwe tê de dibîne, di gêncîtîya xwe de. Xelk her tim dibêjin ew qerekter ji ber sûretê afirînerê wî, ango nivîskarê wî, hatiye girtin. Mirov dibêjin João da Ega alteregoyê nivîskarê kitêbê Eça de Quierós e. Wê çaxê, hinga ez hijdeh-nozdeh salî bûm min pirr xwe wek vî qerekterî, João da Ega, didît.

***Baş e, hemin me got qerekter, ji bo te rola qerekter çi ye di fîksîyonê de? Gelek roman hene qerekterên wan ji wan bêtir tên naskirin... gelo ji ber ku tiştekî temsil dikin, ji ber çi ye vê girîngiya wan?**

Bi min, qerekter bi rastî jî esasê romanan in. Eger tu dixwazî fikrekê yan hestekê neqil bikî, belkî çêtir e ku tu felsefeyê yan helbestê binivîsî. Lê eger tu dixwazî fikrên cihêreng û hestên cihêreng neqil bikî, divê tu wan bi qerekterekî veguhêzî. Çunkî ew wê firsetê didin ku tu fikr û hestên ku ne ên te ne lê ayidî qerekter in, hem derpêş bikî hem rave bikî. Lewma ev rêyeke muezzam e ji bo ku mirov cîhanê ji çavên mirovên cuda bibîne yan hewl bide cîhanê di van nêrînan re neqil bike. Wek nivîskar, ê te nêrîneke te ya cuda û xweser a cîhanê heye, lê dema silsileyeke qerekteran di destê te de hebe tu bi riya wan gelek nêrînên dî ên cîhanê raber dikî. Bi min, ji ber vê yekê qerekter ewqas girîng in ji bo romanê; ew cihêrengîya cîhanê nîşan didin. Ne hewce ye tu bi qerekterê xwe re hemfikir bî, lê divê tu rast û dilsoz bî ji wî qerekterî re. Bi qeneeta min, tişta ku romanê ji celebên dî ên hunerê cuda dike ev e. Helbet tu dikarî, şanonivîsîyê, filîman jî bihejmêrî... lê bi raya min meseleya romanê cuda ye, tê de bêtir dema te heye, gelek rêyên cûr bi cûr ên naskirina qerekterekî pêşkêş dike. Di şanoyekê de qerekter lazim e biaxive, tiştên di hişê wî re derbas dibin bibêje; lê di romanê de bê deng be jî dibe, tu dikarî fikr û hestên wî binivîsî. Di şanoyê de divê biaxive ji bo ku tu kesayetîya wî, tevgerên wî nas bikî. Di romanê de gelek rê û rêbazên dîtir hene ji bo ku tu qerekterekî nîşan bidî, dikarî ji gelek alîyan de nêzîkî wî bibî. Ji bo min qerekter dilê romanê ne, wî dilê ku dike kutekut.

***Li gor ku ewqasî girîng in, şêwaza te ya afirandin û lêkirina qerekterekî çi ye? Tu ji nimûneyên jiyana rastîn sûdê werdigirî yan bi îlhameke xwerû tevdigerî?**

Ya rast, ew dimîne li ser qerekter bi xwe. Hin qerekter hew ji ber detayeke ku ez di mirovekî de dibînim çêdibin. Lê dibe ku tiştek be ku te ew di rojnameyekê de xwendibe yan xeyal kiribe. Dibe ku mirovek be ku te li kûçeyê ew dîtibe. Awayê ku yek bi rê ve diçe, rengê porra wî. Carekê min keçikeke porsor dît, ewqas tesîr li min kir ku... ji ber ku... gelekî xweşik bû, porra wê sor, kurt. Vî wêneyê keçikê di hişê min de ma, di pey re, gelekî gelekî di pey re, min vê detaya porra sor ji bo qerektereke xwe bi kar anî.

Helbet min tiştek di heqê vê keçikê de nizanibû. Lê min wê hûrgilîya hanê bi kar anî. Carina jî tu pêşî tenê tiştekî xeyal dikî, dû re detayan ji mirovên dî werdigirî –



Eduardo Martins/FLM

***Tu jî yek ji wan mirovan î? Qerekterên te tiştek ji te jî wergirtine? Tu ji xwe jî sûd werdigirî di çêkirina wan de?**

Belê, hin qerekter wusa ne, te dî... Vebêjê (vegêrê) romana min a pêşî, dişibe min; lê ne bi her tiştê xwe. Ew ne ez im. Lê bi rastî ez naxwazim xwendevan wiha his bike ku qerekter tenê qûqleyek e di destê min de. Divê xwendevan his bike ku qerekter xweser e, serbixwe ye, zindî ye; ne tenê qûqleyekî di destê min de ye. Ji ber wê ez naxwazim qerekter bişibin min, ji xencî vebêjê romanê. Ez dixwazim wê hestê biafirînim ku dibe ku vebêj nivîskar be. Ev jî, ez dikarim bibêjim ku fen û finaseke wêjeyî ye. Tu bi bendewarîyên xwendevan dilîzî. Ev tiştekî cuda ye. Dema ez derbarê qerketerên bi temamî cuda de dinivîsim, ez naxwazim hestên xwe û hizrên xwe têxim nav wî qerekterî. Ez hewl didim xeyal bikim, ew qerekter dê çawa tevbigere û bihizire... helbet ez dikarim hin tiştên ji serpêhatîyên xwe jî bi kar bînim. Ev qerekter dê ji filîmên çawa hez bike û temaşe bike, dê ji kîjan muzîkê hez bike?.. Dû re hezkirinên xwe û ên wî tînim ba hev, û qerekterekî lêdikim. Lêbelê, bi pirranî ez naxwazim qerekter bibe parçeyekî ji min, divê ew yekî dî be. Ez hez dikim di şûna yekî temaşeker de bim. Dema tu derheqê kesên di kûçeyê re diçin de dinivîsî, tu li wan temaşe dikî. Ew ne tu ne, û tu jî wan wek xwe nahesibînî. Ew kesên dî ne. Ez heman tiştî ji bo qerekterên xwe jî dikim. Ew di kûçeyê re diçin, ez wan dibînim û di heqê wan de dinivîsim. Helbet tişta herî girîng aşop e, xeyaljenî ye ji bo nivîsînê... xeyalkirina ku ew kes çawa his dike û dibîne.

***Em werin ser romanên te. Romana te ya pêşî gelekî hat ecibandin û gelek xelat wergirtin. Em dizanin çapkirina kitêba yekemîn çiqas zehmet e, te bi ser de pê re serkeftineke gelekî baş jî bi dest anî? Çawa wiha bû?**

Bi rastî ez jî nizanim. Ji bo min çapkirina wê hêsan bû. Weşangerê min dizanibû ku ez tiştekî dinivîsim. Ji min re got, “Ez dixwazim ku tu vê romanê biqedînî, çunkî ez dixwazim wê çap bikim.” Lewma, berî ku ez wê biqedînim, min dizanibû ku dê çap bibe. Evê yekê gelekî rihetî û bawerî da min. Dema wusa ye, mirov dikare hin rîskan jî bigire. Belkî jî bi xêra van rîskên dema nivîsîna romanê bûn... çunkî gelek têbînî tê de hene û avasaziya wê ne xêzerastî (linear) ye; herwiha beşên cuda ên behsa qerekterên cuda û bûyerên cuda dikin tê de hene. Ez dibêm kitêb bi rastî jî weke kitêbeke nû, weke tiştekî teze hat dîtin; hesteke wiha da mirovan. Helbet salixê taxeke feqîr dida ku pirr kêm xuya dikir di romana Portekizî a nifşê min de. Wexta ez dîzivirim û berê xwe didimê, ez dibêm belkî van tiştên têvel hişt ku wê serkeftinê, wan xelatan bi dest bixe. Lê ev ne tiştekî wiha ye ku tu, wek nivîskar, kontrol dikî.

***Vêca hêvî û bendewarîyên te ên ji bo romana te ya duyem çi ne? Ew jî van rojan dertê...**

Serê pêşî, ez dibêm min romaneke baştir nivîsî. Ez bawer im kitêbeke hîn bêtir kemilî ye, û ez ji vê dilxweş im. Ez nizanim mirov dê çawa wê bixwînin, ew berpirsiyarîya xwendevan û rexnegiran e; ê min ji kitêbê hez kir, weşangerê min jê hez kir, hin kesên ku min ji wan re şand got ku baş e. Helbet piştî serkeftina romana pêşî belkî niha hin mirov hene ku standardên xwe danîne û li bendê ne ku vêya nû li gor wan bendewarîyan binirxînin. Belkî mirov dixwazin kitêbê rexne bikin, ji ber ku a berî wê serkeftî bû. Ez ji her tiştî re amade me. Wek nivîskar, divê tu standardên xwe daynî. Tu nikarî li hêvîya mirovan bî ku standardên te ji bo te damezrînin. Lazim e tu bi xwe pirr tiştan ji xwe bixwazî.

Bi min tişta herî girîng ev e. Ji bo ku tu pileyê berjêr nekî, divê standardên te ên bilind hebin, ne li benda xwendevanan, weşangeran, rexnegiran bî ku ji te re bibêjin divê vê yan wê binivîsî. Vêca, piştî ku te romanek qedand, ew êdî ji kontrola te dertê, divê amade bî ji her bersiv û berteka xwendevan û rexnegiran re.

***Di romana xwe ya duyem de, te ji serpêhatîyeke rastî sûd wergirt? Dema mirov bi tiştekî zêde zanibe, qalkirina wê ne zehmettir e?**

Ez qebûl dikim ku diyardeyên rastîyê carina tiştan zehmettir dikin. Dibe ku mirov wiha bifikire ku çiqas diyarde û dane di destên wî de hebin ewqas hêsantir e, lê bi min ne wiha ye. Dema gelek diyarde bi te re hebin, tu weke felcbûyîyan his dikî, çunkî wek nivîskar tu nîgaşa xwe bi kar tînî. Hebûna gelek diyardeyan cî li xeyaljenîyê teng dike. Di serî de, min digot ev dê kitêbeke ne-fîktîf be. Pêlekê, ez têgihiştim ku eger ez bi diyardeyan ve girêdayî bimînim, ez ê nikaribim kitêba ku dixwazim binivîsim. Ew ê bibûya kitêbeke dî û min nedixwest wê kitêbê binivîsim. Min fahm kir ku diviya ez fîksîyonê binivîsim ji bo ku bigihêjim rastîya derbarê qerekterê sereke de. Çunkî min bi pirsekê dest pê kiribû: “Ev lawik kî bû?” 29 salî bû dema hat kuştin. Min xwest bizanim ew kî ye. Ev pirsa yekemîn û herî girîng bû. Dema nivîsînê serwext bûm ku diyarde têrê nakin bo naskirina vî qerekterî û di nîvê wê de min berê xwe guhert û biryar da kitêbeke fîksîyonê binivîsim, tevî ku di kitêbê de tiştên rastî jî hene.

***Tu iddîa dikî ku fîksîyon êdî tenê di kitêban de tê xwendin, di kovar û rojnameyan de cî jê re tine. Carina bi te ne wiha ye ku rûdanên jiyana rastî ên di nav rûpelên wan weşanan de ji fîksîyonê bi xwe fîktîftir in?**

Belê, carina mirov ji jiyana rastî hema bêje bawer nake. Lê ev ji ber wê ye ku jiyana rastî ne mecbûr e hevgirtî be. Di fîksîyonê de tu mecbûr î maneyekê ji tiştan derxî. Lê di jiyana rastî de tu ne mecbûr î. Her tişt dibe ku biqewime. Qerekterê sereke di jiyana rastî de dikare sibê bimire. Lê tu nikarî qerekterê sereke di deh rûpelên pêşî ên romana xwe de bikujî, eger qerekterê esasî ew be. Lewma cîhana rastî ne hewce ye cîyê bawerîyê be, gelek tiştên beradayî dikarin rû bidin, û jiyan ev e. Lêbelê, di fîksîyonê de zagonên te hene. Ev ne zagonên ji derve ne. Roman bi xwe hin zagonan dixwaze. Her roman lazim e hevgirtî be, mîna ajeleke ku hilmê distîne û dide be. Ev zagon jî ji bo wê romanê bi xwe ne. Herçî jiyan e, zagonên wê tine ne, her tişt dikare rû bide. Nizanim bê yek jiyana me dinivîse yan na, lê eger dinivîse, ew yek ne romannivîs e. Çunkî carina hin tişt yekcar bê mane ne. Lê di romanê de, lazim e ku maneyeke wan hebe.

“Dûmahîka hevpeyvînê li ser malpera basnews.comê ye”

Nadia Visser:

Muzîka kurdî bi êşên kûr hatiye pêçan

NÛJÎN ONEN

Dengdana stranên Kurdî zehmet e. Ev ji bo stranên Îngilîzî jî wiha ye ji bo yên Kurdî jî. Ji bo min di muzîka kurdî de tişta herî zehmet bicîhkirina hestan e, ji bo strana ku dibêjim. Gelek stranên muzîka pop ya Îngilîzî tenê li ser dildarî an jî hevberdana dildaran e lê muzîka Kurdî, bi taybetî jî ya Zazakî bi êşên kûr hatiye pêçan.

NADIA Viseer ji strana Metin-Kemal Kahraman ya Hala Bêrê ya Mikail Aslan Şiye û heta ya Şivan Perwer Yarê distrê . Jina muzîkjen li bajarê Hollanda yê Bredayê dijî di heman demê de jî xwendekara zanîngehê ye. Nadia evîndara muzîka Kurdî ye bi taybetî jî ya zaravayî Kurmanckî (Zazakî) ye. Him stranê Kurmanckî him jî yê Kurmancî distrê, her wiha ji bo hînî zaravayê Kurmanckî bibe perwerdehiyê jî distîne. Nadia Visser nêzî 8 sal e li ser muzîkê dixebite, ji xeynî ziman û muzîka welatê xwe berê xwe bi Kurdistanê vekiriye bi saya projeyekê rêya wê bi Dêrsimê ketiye û li wir tovê evîna muzîka Kurdî di dilê wê de şîn bûye. Bi dengê xwe yî tenik awazeke cûda deng daye stranên Kurdî û hîn jî ev hezkirina wê û berdewam dike. Di heman demê de Nadia Visser bûka Kurdan e hevjînê wê Alan Ciwan e bi xwe şanogerekî Kurd e ji Batmanê ye. Nasîna Nadia ya muzîka Kurdî beriya zewaca wê dest pê dike. Nadia dibêje beriya Alan, min dest bi hînbûna Kurmanckî kiribû. Ka werin em çîroka muzîkjena Hollandî ji wê guhdar bikin. Stranbêj Nadia Visser ji Heftenameya Basê re behsa hezkirina xwe ya li hember muzîka Kurdî kir.

Ji ber gelek sedeman hin hunermendên Kurd berê xwe ji muzîka Kurdî diguherinin, bi zimanê biyanî distirên, hin muzîkjenên biyanî jî hene ku berê xwe bi muzîka Kurdî ve dike. Yek ji muzîkjenê biyanî ya berê xwe bi muzîka Kurdî vekiriye Nadia Visser e. Çi bûye sedem ku muzîkjena Hollandî berê xwe bi muzîka Kurdî vekiriye û bûye dildareke stranên Kurmanckî ? Derbarê vê yekê de Nadia bi me re van agahiyan parve dike;

Di sala 2012an de ez çûm Dersîmê bi helkefta projeyeke bi navê Music Generations. Li wê derê min him xweza û him jî mirovên wir nas kirin. Min li muzîka wan guhdarî kir. Ev yek tecrûbeyeke gelekî cûda bû ji bo min. Me li wê derê çend konsêrt li dar xistin û me bi zimanê wan bi Zazakî stran ji wan re gotin. Tiştekî zahf xweş bû dema min ew kêfxweşiya li ser rûyê xelkê deverê dît. Belê min tenê bi stranekê ew kêfxweş kiribûn. Min jî got heke ev muzîk karibe tiştekî wiha bêhempa bike divê ez berdewam bikim.

Muzîka Kurdî xwedî roleke mezin e di warê berdewamiya zimên de.

Nadia Visser tenê bi dengdayîna stranên Kurdî qîma xwe neaniye di heman demê de fêrî Kurmanckî bûye derbarê vê wiha amaje dike;

Di destpêkê de ez ne xwedî zanyariyeke wiha bûm ku çend zaravayên zimanê Kurdî hene. Lê ez çawa bi ser Zazakî vebûm ez bûm, dildarê wê. Ew deng, çand û dîrok bi giştî tiştên nû bûn ji bo min. Stran gotina bi vî zimanî mîna serpêhatiyeke balkêş bû ku ez pê hînî gelek tiştên nû bûm. Hînî gelek stranan bûm, li dû wê min hewl da fêm bikim bê tên çi wateyê. Bi vî rengî Zazakî bû zimanekî ku min xwest fêr bibim. Ez di wê baweriyê de me ku muzîk xwedî roleke mezin e di warê berdewamiya zimên de. Ji bo Zazakî jî ev xaleke gelekî girîng e.

Dema jineke Hollandî bi zaravayekî zimanê Kurdî stranan distirê, Kurdan helwestek çawa nîşan da ye liser vê Nadia wiha diaxive;

Xelkê bertêkên gelekî şêrîn nîşanî min dan. Heke ez bi awayekî eşkere bibêjim destpêkê min fêm nedikir bê çima wiha tevdigeriyan. Lê piştî ku min derbarê dîroka Kurdan de çend xwendin kirin, min bêhtir gel û hûnera wan nas kir. Vê yekê hêzeke xurttir da min ku ez bi zimanên Kurdistanê muzîka xwe berdewam bikim.

Dema ez distrêm ez çavên xwe digrim da ez bikaribim bêhtir hestên xwe derxînim holê

Serdana muzîkjena Hollandî ya Dêrsîmê, bûye sedem ku stranên Kurmanckî bistrê, lê gelek ji wan strana li ser karesetên li Dêrsimê qewimiye hatiye nivîsandin. Dema jê dipirsim haya te ji van karesetan jî heye yekser bersiva min da û wiha berdewam kir ;

Nasîna miletekî tenê bi xweşî û şahiyên wan nabe. Divê haya mere ji êşên wan jî hebe. Ji ber vê yekê ravekirina hestên min jî zehmet e bo min, dema distrêm... Ji ber ku hema bi carekê re diherike. Ne ku ez gelekî li ser difikirim û dixebitim berî bistirêm. Dema ez gotinên stranekê dibihîzim an jî li muzîka wê guhdarî dikim ez bi ser wateya stranê vedibim û hewl didim ku wê bighînim gel. Ez muzîka hestbar nadim bi ya profesyonel û tehmsar. Ji ber wê yekê dema ez distrêm hewl didim aram bim û dêhna xwe bidim ser hestên xwe. Zorê caran dema ez distrêm ez çavên xwe digrim da ez karibim bêhtir hestên xwe derxînim holê. Kurmanckî ji aliyê UNESCO ve di kategoriya zimanên ku di bin xeteriya wendabûnê de tê nîşandan. Dema ez ji Nadia re behsa vê yekê dikim ew jî girîngiya ziman û hûnerê wiha amaje dike;

Bi baweriya min muzîk amrazeke girîng e bo parastin û berdewamiya zimanekî. Bi vî hawî dikare hişmendiyek ava bibe. Hin xebatên rêzimanî hene helbet ji hêla akademîk ve ji bo parastina ziman û vegûhastina wê bo nifşên dahatû. Lê belê ji bo gel karibe têkelî bibe, hûner divê. Halê hazir ez li ser çend besteyan dixebitim. Bi min, ji ber ku ez bi eslê xwe ne Kurd im, ev him dibe fersendek him jî kelemek di heman demê de. Ez bi axaftina Zazakî mezin nebûm lewra jî bi îhtimaleke mezin hêza zimanê min jî wê negihêje wek asta keskî ku ji dema çêbûye bi vî zimanî xeber dide. Ez li gel zimanekî biyanî bi guhdarîkirina muzîkeke ciyawaz mezin bûm. Helbet ne ji bo nifşê me lê ez ji bo nifşê ser me re dibêjim. Ev yek dê bike ku muzîka min bi awayekî xwezayî ber bi hêleke din ve biçe. Bi ya min tiştekî baş e ku zimanek xwedî muzîkên curbicur be. Lewra ev tê wateya ku dê guhdar jî her ewqas cûrbicûr bin û wê ev yek ziman zindî bihêle. Îjar jî em ji Nadia Visser bipirsin ka helwesta Hollandîyan li hember muzîka Kurdî çawa ye, helwesteke erênî an neyênî nîşan dane? Li ser vê muzîkjena biyanî wiha dipeyive;

Em muzîka ku ne ji perçê cîhana me ye, wek muzîka cîhanî bi nav dikin. Dema xelk cara pêşî dibihîze ku ez "muzîka cîhanî" çêdikim hinekî ecêbmayî dibin. Ji ber ku baş nizanin bê çi ye. Dema lê guhdarî dikin gelekê wan jê hez dikin. Malbata min û hevalên min timî bûn piştgir bo min. Heta diya min û pîrika min çend stranên ku ez distêrem jî dikarin bistrên lê helbet ne peyvên wan, melodiya wan.

Muzîka kurdî, bi taybetî jî ya zazakî bi êşên kûr hatiye pêçan

Muzîkjena Hollandî nêzî 8 salan e ku bi muzîkê re mijûl e, cûdahiyên di navbera muzîka biyanî û Kurdî heye bi çi awayî ji hevûdu cûda ne? An jî aliyên ku dişibin hevûdu wiha diyar dike;

Dengdayîna stranên Kurdî zehmet e. Ev ji bo stranên Îngilîzî jî wiha ye ji bo yên Kurdî jî. Ji bo min di muzîka Kurdî de tişta herî zehmet bicîhkirina hestan e, ji bo stranên ku dibêjim. Gelek stranên muzîka pop ya Îngilîzî tenê li ser dildarî an jî hevberdana dildaran e. Stranbêja biyanî him stranên Kurdî distrê di heman demê de haya wê ji bûyerên ku hatine serê Kurdan jî heye derbarê vê jî wiha dipeyive ;

Muzîka Kurdî, bi taybetî jî ya zaravayê Zazakî bi êşên kûr hatiye pêçan. Ji ber vê yekê jî bîra mirov divê her wan êşan bizanibe. Lê li hêla din muzîka Îngilîzî bêhtir pala xwe dide aliyê teknîkî.

Ji xeynî stranên Kurmanckî muzîkjena Hollandî stranên Kurmancî jî gotiye yek ji wan jî ya Şivan Perwer strana ''Yarê" ye. Di muzîka kurdî de zehmettirîn stran jî yên hunermend Şivan Perwer in. Ji bo Nadia Viseer taybetmendiya hunermendê Kurd heye an na em ji wê guhdar bikin;

Ji ber ku ez bêhtir li muzîka Zazakî guhdarî dikim, nikarim bibêjim ku muzîka Şivan Perwer bandoreke mezin li min kir. Lê dema ez dixwazim li ser stranekê bixebitim, dibînim ku gelek ji wan an ji hêla wî ve hatine nivîsandin an jî gotin. Stranên ku ew dibêje li gor yê din zehmettir in ji hêla teknîkî ve. Ev yek jî wan balkêştir dike.

Nadia Visser di heman wextê de bûka Kurdan e. Hevjînê wê Şanogerê kurd Alan Ciwan e ji gundê Hêsarê yê girêdayî Batmanê ye. Dema ez ji muzîkjen Visser dipirsim bandora hevjînê te li ser nêzîkbûna ziman û muzîka Kurdî kir? Dibêje;

Beriya ku wî nas bikim ji xwe hînî Zazakî dibûm û vêga hin caran ez hewl didim ku hin pêyvan fêrî wî bikim. Lê helbet dema ez dixwazim straneke Kurmancî bistirêm, ez her tim jê dipirsim bê ka ez gotinên wê rast dibêjim yan na. An jî bê wateya wê çi ye. Lê ji ber ku Alan jî di warê hunerî de wek şanogerekî dixebite em dikarin bêhtir li ser ziman an jî hunerê biaxivin û ji hev hînî tiştên nû bibin.

Nadia Visser heyranê du hunermendên muzîka Kurdî ye, yek jê du bira Metin-Kemal Kahraman in ê din jî Mehmet Akbaş e her wiha bandora wan jî li ser wê gelek e. Di dawiya axaftina me de daxwazên xwe wiha anîn zimên;

Ez heyraneke mezin ya Metîn - Kemal Kahraman û Mehmet Akbaş im. Ez dikarim bi seatan li muzîka wan guhdarî bikim. Ez wiha bawer dikim ku ew gelekî girîng in ji bo berdewamiya zimanê Zazakî. Wek min anî ziman, bi ya min tiştekî zahf girîng e ku stranên berê jî bên gotin û yên nû jî li wan bên zêdekirin bi şêwe û stîlên nû. Heke bibe ez dixwazim li gel Mehmet Akbaş stranan bibêjim ku bêhtir şêweyê wî caz bûya.

Ez heyraneke mezin ya Metîn-Kemal Kahraman û Mehmet Akbaş im. Ez dikarim bi seatan li muzîka wan guhdarî bikim. Ez wiha bawer dikim ku ew gelekî girîng in ji bo berdewamiya zimanê Zazakî. Wek min anî ziman, bi ya min tiştekî zahf girîng e ku stranên berê jî bên gotin û yên nû jî li wan bên zêde kirin.